Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1371 26-Nîsan-2026 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ rojnameyaronahi @ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com Rojnameya Ronahî +963 984 370 218

# Bi firotina çay û qehweyê debara jiyana xwe dike

**Hêvî Keleş/ Qamişlo**

**Tevî dahata kêm, buhayên bilind û zehmetiyên jiyanê, welatiyê bi nave Ehmed Şêxmûs ku ji bajarê Qamişlo ye, bi firotina çayê û qehweyê têkoşîna xwe ya rojane didomîne û hewl dide ku debara malbata xwe peyda bike.**



Çîroka Ehmed Ebdul Baqî Şêxmûs rastiya beşek fireh ji karkeran nîşan dide ku di bin şert û mercên aborî yên dijwar de, xwe dispêrin karê rojane yê bi dahata kêm. Di navbera lêçûna jiyanê ya bilind û kêmbûna derfetan de, hêviya dîtina karekî çêtir hîn jî hêviyeke zehmete.

### Têkoşîna rojan e

Li yek ji kolanên Qamişlo, Ehmed Ebdul Baqî Şêxmûsê yê pêncî salî li pişt dikana xwe ya biçûk radiweste, ku bêhna çayê û qehwe jê tê. Ew roja xwe zû dest pê dike, amûrên xwe yên pêwîst hildigire, hewl dide ku debara xwe bi firotina vexwarinên germ ji rêwiyan û xwediyên dikanên cîran re bike. Tevî sadehiya karê wî, hûrguliyên roja wî çîrokeke têkoşîna rojane ya li hember rastiyeke aborî ya dijwar eşkere dikin.

Şêxmûs, ku gelek meh di vî warî de derbas kir, ev pîşe ji ber pêdiviyê hilbijart, ne ji ber hewesê ew dibêje ku karê wî hinekî baş e, lê ew nagihîje asta ku bibe çavkaniyek têrker ji bo debara malbata wî, ji ber ku dahata ku ew qezenc dike bi zorê hewcedariyên bingehîn ên rojan e peyda dike, bêyî ku şiyana xilaskirin an baştirkirina asta jiyana xwe hebe.

Şêxmûs yek fîncanek çayê bi hezar lîreyên Sûrî difiroşe, ku ev bihayek kêm e li gorî bihayê tiştê ku ew dikire. Her çend ev biha kirîdaran dikişîne jî, ew ji bo wî têra xwe qezencê çênake, wekî ku wî piştrast kir: "Bihayên bilind ên madeyan, wek şekir, çay û qehwe, wî di navbera parastina kirîdaran xwe û bidestxistina dahatiyek maqûl de xistiye rewşek dijwar." Dahata wî ya rojane ya navînî nêzîkî 25 hezar lîreyên Sûrî ye, ku ew vê mîqdarê wekî pir kêm li gorî pêdiviyên jiyanê bi nav dike. Bi zêdebûna berdewam a bihayan re, ev dahat êdî têrê nake ku pêdiviyên bingehîn ên tevahiya malbatekê peyda bike, nemaze ji ber ku ew tekane dabînkerê malbata xwe ye.

Şêxmûs got: "Ev kar bi zorê têra xwarina malbata min dike. Em her roj tenê ji bo debara xwe dixebitin, ji bo sibê tiştek garantî nîne." Li gel van şert û mercan, Şêxmûs hîn jî hêvîdar e ku karekî çêtir bibîne. Ew bi berdewamî li karekî digere ku dahatiyek baştir peyda bike, lê ew ji ber kêmbûna derfetan, nemaze ji bo kesekî di temenê wî de û xwedî ezmûnek kêm di warên din de, bi zehmetiyan re rû bi rû dimîne.

### Buhayê pêdiviyên jiyanê yên bilind wî diwestîne

Rewşa Şêxmûs ne tenê rewşa kesekî ye, ew rastiya gelek kesan li bajar nîşan dide. Bi xirabûna şert û mercên aborî û zêdebûna lêçûnên jiyanê re, tevî bêîstîqrariyê, xwe dispêrin karê rojane. Şêxmûs destnîşan kir ku tiştê herî zêde barê wî dikişîne ne tenê dahata wî ya kêm e, lê di heman demê de hesta bêewlehiya darayî jî ye. Nebûna çavkaniyek dahatê ya sabît an ewlehiya civakî wî di rewşek fikarên domdar de li ser pêşerojê dihêle, nemaze ji ber berpirsiyariyên wî yên li hember malbata wî. Tevî van hemûyan, Şêxmûs hewl dide ku li ber kirîdarên xwe kenê xwe biparêze, bi moralekî baş çay û qehwe pêşkêşî wan dike, mîna ku ev hewldanek biçûk be ji bo berxwedana li hember dijwarbûna rastiyê, nîşan dide ku ev kenê beşek ji karê wî ye û dibe ku di heman demê de amûra wî ya parastina hêviyê ye.

Çîroka Ehmed Ebdulbaqî Şêxmûs wêneyekî zindî yê êşa beşek fireh a civakê ye, ku rojane li hember rastiyeke aborî ya bêrehm ji bo jiyanê têdikoşin.

Gotina Dawî

## Edaleta Civakî û HTŞ



Mihemed Seydi

Li devereke wek Sûriyê di bin banê sîstemeke şovînîst, islamîst, baasî û nijadperest de, wê çawa qale edaleta Civakî were kirin? Di demekê de destê her alî di nava rijandina xwîna xelkê Sûriyê de heye, gelo kî wê sucdar be û kî dikare rola dozger bilîze? Berî çend rojan, kesekî bi navê Emced Yusif hat girtin. Li gorî çîrokê, vî kesî di sala 2013'an di meha Nîsanê de li taxa Tedamin a Şamê komkujî pêk aniye. Ev kes ew e ku di vîdyoya 41 kesên çavgirtî davêjin çeilekê û wan dikujin de xuya dibe. Bi vî awayî navê Emced Yusif ku endamekî Ewlehiya Leşkerî ya rêjîma Baas e, di sala 2022'an de derdikeve ser dezgehên ragihandinê. Hat ragihandin ku ev kes di 24'ê Nîsana 2026'an de li gundewarên parêzgeha Hemayê hatiye girtin û wekî bûyereke gelekî mezin qewimiye û Edaleta Civakî wê pêk were propaganda wê hat kirin. Berpirsên HTŞ ku niha li Şamê desthilatin, derketin ku gotin ew ê vî kesî li pêş raya giştî darzînin û mafê qurbaniyan vegerînin. Li ser wê yekê Tomas Barack ku nûnerê serokê DYA li Sûriyê ye, wî jî bi riya X daxuyaniyek da û got ku girtina vî kesî cihê kêfxweşiyê ye û dîsa kir wesîla pesna Ebû Mohemed El-Colanî bide. Di demekê de xelkê Sûriyê di bin silogana parastina rûmetê de hêdî hêdî çalakiyan organîze dike, bi vî awayî dixwazin li ser bangên gel bigrin. Li Sûriyê, ji ber sererd û binerd tê talankirin û hemû saziyên xizmetê tên firotin, bi derxistina van rojevan dixwazin xelkê bi tiştekî cuda re mişxul bikin. Wer xuyaye ku şêfê van çîrokan hemû jî Tomas Barack e. Wê her çend mehan carekê, ku milet ji bo debara jiyanê ketiye helaketê û wê rabe ser piyan, bi van bûyeran dixwazin li du çûkan bidin. Yek, bibêjin binêrin, ew li dixebitin da sucdar werin darzandin û li aliyê din dixwazin van komkujiyan bi bîra xelkê bînin da bêdeng bibin û daxwaza mafê xwe nekin.

Di demekê de ku dixwazin bibêjin wan kesek ku destê wî di komkujiyeke derheqê xelkê Sûriyê de heye girtine, bi hemû zilamên ku bingehê rêjîma Baas in re li hev dikin û pereyan ji wan digrin. Yanî, sucdarên esasî re ango bi rêjîma sucdar re li hev dikin û ji bo vê yekê veşêrin, derdikevin û dibêjin ku wan hin kes girtine. Erê, milet li Sûriyê Edaleta Civakî dixwaze, lê dozger û dadwer bi xwe sucdar be ew ê çawa bibe? Wezîrê Dadweriyê yê desthilata Colanî yê bi navê Mezher El-weîs bi xwe sucdarekî herî mezin e û vîdyoyên wî yên fermana kuştina Sûriyan jî peyda dibin. Wê demê kî wê Edaletê bi cih bîne û kîjan Edalet? Emced Yûsif kesekî di bin navê sucdariyê de hatiye girtin, lê Hatim Ebû Şeqra ku kujerê siyasetmedara Kurd Hevrîn Xelef e û Ebû Emşe ku hemû sucên li Efrîn, beravê û Siwêdayê navê wî derbas dibe, li derve serbestin. Gelo rastî jî HTŞ'ê li pêyî Edaleta Civakî ye an li pêyî mijulkirina xelkê ye da lingên xwe bi cih bike?

## FERHENGA BIWÊJAN

Destê me girê da:
- Em êdî nikarin tiştekî bikin; ti derfet di destê me de neman; riyên çareseriyê tev li pêşiya me hatin girtin.
Dest û lingên me hatin girêdan:
- Bi heman wateyê.
Erdekî hişk ezmanekî birîng:
- Emê çi bixwin vexwin? Em bêçare ne.
Erdekî hişk ezmanekî vala:
- Bi heman wateyê.
Ez ketim deravê teng:
- Pirsgirêk ji min re derketin.
Fira mirîşkê heta enîşkê:
- Cihekî ku pê ve biçe nîne; nikare xwe rizgar bike; derfetên wî pir nînin
Fira mirîşkê kadîn e:
- Bi heman wateyê.
Ji ber derketiye;
- Nikare ya xwe çareser bike; nikare ji ya xwe rizgar bibe.
Ji ber ya xwe derketiye:
- Bi heman wateyê.
Ji ber ya xwe daye der:
- Bi heman wateyê.
Kêr gihatiye ser hestî/kêr gihatiye hestî:
- Êdî nayê xwarin; êdî nayê borandin; êdî nayê tehemulkirin.
Li deriyekî din bigere:
- Karê te li cem min pêk nayê; li devereke din li çareseriyê bigere.
Nanê yekî di avê de çûbû digot; bila xêra dêbavên min be:
- Ji destê wî derketiye ji lew wisa dibêje; ne bi xwesteka xwe dide; nikare tiştekî bike ji lew wisa dibêje.
Ne ji dêrê dibe ne ji mizgefte/ne ji dêrê dibe ne ji vangê:
- Nikare xwe ji her duyan jî qut bike.
Riha wî di nava lepên min de ye:
- Bê min nikare tiştekî bike; nikare bê min xwe bilivîne.
Serê ben li ber winda bûye:
- Ketiye rewşeke pir xirab; nikare ji navê derkeve.
Ser serê xwe û heft bavê xwe razî ye:
- Mecbûr e razî be; weke din çareya wî nîne.
Seyê birçî hestiyan jî dialîse:
- Kesê bêçare serî li her rêbazê dide.
Xwezî Xwedê kulmek ax bida min:
- Xwezî Xwedê ruhê min bistanda; xwezî ez bimiram.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

Bi kamîreya Ayşa Silêman



## 'Mersûm mafê zimanê Kurdî garantî nake, divê destûr hebe'

Mamosteya Zimanê Kurdî li Zanîngeha Rojava Mizgîn Hesen diyar kir ku hikumeta demkî zimanê Kurdî wekî zimanê niştîmanî destnîşan kiriye, lê zimanê niştîmanî piştgiriyeke çandî hildigire, lê tu piştgiriyek yan berpirsyariyeke destûrî hilnagire û got, "Pêwîst e zimanê Kurdî mîna Erebî zimanê hikumet, bazar, diplomasî, perwerde ... yê welat be."**R-5**



## Di herikîna dîrokê de rastiya pêşengtiya jinên Kurd (1)

Ji dayikekê ta meydanên şer, ji qadên siyaset, dîplomasî, zanist û edebiyatê heyanî qada huner û dengbêjiyê; Jinên Kurd bi sekna xwe ya bi hêza pêşengî ji civak û serdeman re kirine.**R-2**



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1371 26-Nîsan-2026 www.ronahi.net/ku/ Nirx: 500 L.S

# KONFERANSÊ SALEK DERBAS KIR, ERKA PARTIYÊN KURDÎ ÇI YE?

Konferansa Yekrêzî û Yekhelwestiya Kurdî ya Rojavayê Kurdistanê salek derbas kir, ji encama konferansê belgenameyek hat nivîsandin û şandeyek hat avakirin. Tevî gelek hewldanên domandina kar û xebatê jî, lê hîna negihiştiye armancên xwe, di nava geşedanên heyî de ji bo vejandina ruhê konferansê û bidestxistina mafên gelê Kurd, erka partiyên Kurdî çi ye?**R-6**



## Di serdema teknolojiyê de; hilweşîna pîvanên jiyanê



Teknolojiya amûreke girîng e û dikare sûd jê were girtin, lê ger bi awayekî ne rast bê bikaranîn ziyanên mezin bi xwe re tîne. Niha jî bûye sedema hilweşîna pîvanên jiyanê. Gelo sedema vê yekê teknolojiya ye an mirov bi xwe ye?**R-7**

## Ji çiraxên wêjeya Kurdî



Helbestvanê Kurd Melevan Resûl; Ji awazê ber bi gotinê û ji helbestê ber bi kepezê ve. Gotinên wî bi xîmava hesta zelalbûyî têne çêkirin û ew di axa xwe ya neteweyî de diçîne, da ku geş bibin tîpên mîna sirûdên dayîkên Kurdan di şevên çiyayî de.**R-9**

## 'Barana zêde zirar gihand zeviyên çandiniyê'

Cotkarên bajarê Dêrikê diyar kirin ku barana zêde ku di rojên dawî de li herêmê bariya ye, zerareke mezin gihandiye ziviyên çandiniyê.**R-8**



Navlêkirin û Hişmendiya Civakê
İsyan Karadeniz R-2



Şêwra xwendina bi komî
Remezan Olçen R-9

# Di herikîna dîrokê de rastiya pêşengtiya jinên Kurd (1)

Ji dayikekê ta meydanên şer, ji qadên siyaset, dîplomasî, zanist û edebiyatê heyanî qada huner û dengbêjiyê; Jinên Kurd bi sekna xwe ya bi hêza pêşengî ji civak û serdeman re kirine.

**Esma Mistefa**

Dîroka ku bi destê zilam û dewletê hatiye nivîsandin wê rastiya hêz û qehremantiya jinan di cîhanê de nede nivîsandin. Efsûne, qehremantî û pêşketinên ku bi herikîna dîrokê re hatine kirin, wê bi dest û keda xwe bidin îfadekirin. Helbet ev ne tesbîtekî ji rêzê ye lê belê rastiyeke ku bi hezaran salan hatiye jiyankirin û di serdema heyî de hatiye eşkerekirin. Hebûn û rola jinan a xwezayî ku di civakan de hebûn. Her wiha weke cinsekê ku hatiye ser rûyê erdê da ku gerdûn temam bibe, û xwezaya mirovahiyê bê domandin, jin hebûn, hêz û îradeyeke ku pêwîstiya jiyan û gerdûnê pê heye. Tunekirina rola wê bi herikîna dîrokê re, helbet ev ne normal e û di serdema heyî de paşguhkirina jina ku weke îradeyekê di jiyanê de temsîl dike, nayê qebûlkirin.
Bi zemên re jin bi zilmên malbatan, hişmendiya welatên kapîtalîst û feodal re rû bi rû mane. Lê di kesayetiya jinê de ev taybetî heye ku baweriya wê ji tiştekî bê, di wê oxirê de heta dawiya jiyana xwe, bi biryarî têkoşîn dike.
Jina Kurd jî di dîroka xwe ya ji hezar salan ve her bûye pêşenga civaka xwe û di dîroka jinên pêşeng ên cîhanê de muhra xwe hêştiye. Ev pêşengtî her çiqasî di bin siya kevneşopiyên civakî, malbatî û zihnietê de rû bi rûyê zehmetiyan û tepisandinê hatibe jî lê ji va taybetmendiya xwe dest berneda ye. Dîroka gelê Kurd bi serhildan, şer û pevçûnên demdirêj yên di navber emperatoriyan, dewlet û desthilatdariyan tijî ye. Di nava van serhildan û şoreşan de bi hezran gelê Kurd ji bo maf û parastina xwe bûne qurbanî. Ev rastiya Kurd û Kurdistanê her çiqas li hember jinê hatibe sekinandin jî, lê nebû hêza tunekirina rola jinê di hemû van geşednan de. Di dîroka gelê Kurd li Cîhanê û bi taybet li Rojhilata Navîn jinan bûn hêza birêvebirina serhildan, şer û civakan.
Ji meydanên şer heya xebatênn civakî, ji siyasetê heyanî dîplomasiyê û ji şerkerkê heyanî dayikeke ku parastina mal û zarokên xwe dike. Ji qada zanist û edebiyatê heyanî qada huner û dengbêjiyê; jinên Kurd bi sekna xwe ya bi hêza pêşengî ji civak û serdeman re kirine.
Ger rastiya jinên Kurd yên qehreman bi demê re hatiye ji bîr kirin, wê demê dîrokê ji bîr nekiriye. Em ê careke din balê bikşînin ser jinên pêşengtî ji civak û serdeman re kirine. Ji çar perçeyên Kurdistanê çend mînakên di dîrokê de heyanî şoreşa ku bi Silogana Jin, Jiyan, Azadî hatiye destpêkirin û bûye yekemîn Şoreşa Jin ya Rojavayê Kurdistanê.

### Ji Bakurê Kurditanê

#### Besê

Di serhildana Dersimê de Besê weke efsaneyek derdikeve pêş. Ji eşîra Alan e ya ku Dersîmê de herî bi nav û deng û hevjîna Seyit Riza ye. Bi welatparêzî, şerkerî û lehengiya xwe bandoreke pir mezin çêdike û li hember dijmin şereke pir dijwar dide. Dibin bombebarana balafiran de heyanê cebilxanya xwe bi dawî dike berxwe dide. Dema ku cebilxaneya wê xilas dibe bi keviran berxwe dide û pişt re ji bona ne keve destê dijmin xwe ji zinaran de diavêje. Serhildana Dersîmê de gelek jinên mîna Besê qehreman derdikevin. Tê gotin ku serhildana Dersîmê de nêzî 1500 jinên Kurd ji bona nekevin destê dijmin de weke Besê xwe ji zinaran de diavêjin yan jî xwe bi çeman de berdidin.

#### Gûlnaz Xanim

Di dîroka agîdiya jinên Kurdan de mînaka din a balkêş jî Gûlnaz Xanim e. Gûlnaz Xanim, serhildana Agîrî de di rêza herî pêş te nava serhildaran de cihê xwe digire. Ji bo parastina sivîlan bi artêşa Tirkan re ketiya nava şerên dijwar de. Tê gotin ku “ dibe tirsa dilê fermandarên Tirk”. Pişt re dîl dikeve destê dijmin. Dema ku bira û kurê wê tên kuştin, dewleta Tirk serî wan û serhildêrek din jê dikin û tîne nîşanî Gulnaz Xanim dikin. Jê dipirsin; “Ka bibîne tu vana nasdikî yan na!’’. Gulnaz Xanim biserbilindî nêzî seriyan dibe; Bi lingê xwe serê Îzzed Beg nîşan dide û tenê dibêje “Ev serê birayê min e”. Piştre serê duyemîn nîşan dide û dibêje “Ev jî serê lawê min e”. Dema ku tê ber serê sêyemîn bi dileke xemgîn dibêje “Heyfa viya bû, pêşmergeyekî xizmetkar û çalak bû”. Ew sekna Gûlnaz Xanim matmayî û bêdengiyeke kur li ser fermandarên Tirk dide çêkirin. Piştre vedigere fermandaran û wiha dibêje; “Berxê nêr ji bo kêr e!’’. Gulnaz Xanim 3 sal di zîndana Milazgir, Mûş û di wargehên leşkeran de dîl digirin û didin xebitandinê. Piştî 3 sal şûnde îdam dikin.



#### Mayan Xatûn

Di sedsala 19’an de jiyan kiriyê û keça mîreke Êzîdiye. Malbata Mayan Xatûn, êş û komkujiyên ku Êzîdî jiber bawariya xwe rûbirû mane têw jê re dibêjin. Mayan Xatûn bi çanda olê Yêzîdî tê mezinkirin. Li gorî wê çandê Meleka Tawus a ku jiber zanyariya xwe li hember xwedî serî radike ya rastî ji milê xwedî ve meleka herî zêde tê heskirine. Jiber ku xwedî zanyar û azadîxwaze. Ango Êzîdî xwedî çandeke zanyarî, azadîxwaz û serhildêrin. Jiber wan teybetmendiyên xwe ola xwe, zimanê xwe û çanda xwe hertim parastine. Mayan Xatûn jineke polîtîk, xwedî hêzeke ramanî bû. Dema ku hewserê wê Mîr Alî Beg dimire Mayan Xatûn dibe rêvebera eşîra Êzîdiyan. Mayan Xatûn bi rêveberiya xwe ya bi adalet bandoreke pir mezin li ser gelê heremê dide çêkirin. Demekî kin de Mayan Xatûn rêveberiya hemû eşîrên Êzîdiyan û heremê digire serxwe. Bi kesayeta xwe ya bihêz li ser rêveberên Tirk û Osmaniyan bandoreke pir mezin dide çêkirin. Mayan Xatûn di dîrokê de yekemîn jineke Êzîdiye ku dibe Mîr û rêweberiya heremekê dike. Jiber ku nava Êzîdiyan de statûya jinê pir jêre.

### Ji Başûrê Kurdistanê

#### Hafse Xana Neqîp

Di 1891’ê de li Silêmaniyê ji dayîk bûye. Di salên şer de, nasnameyek girîng a jinekî bi zanabûna xwe jinên kurd rêxistin kirî û di jiyana civakî de bi bandor e. Jinên ji ber xizanî û çewisandinê tengaviyê dijîn, xwe dispêrin Hafse Xanê. Ew, di aliyê civakî de rêvebera jinan bû. Xebatên xwe yên jin û Kurdistanê yên wê dihizirî ku pir dişibin hev, bi hevre dan meşandin. Di 1930’ê de, di derbarê mafên netewî yên kurdan de nameyekê dinivîse û ji bo Cemiyeta Miletan (NY) dişîne. Ev bi navê Kurdan destpêk bû. Hafse Xan, ji bo zanabûna jinên kurd pir zêde xebitî. Di damezirandina rêxistina Yekîtiya Jinên Kurdistanê de cih girt û jê re serokatî kir. Her wiha dibistanekî şevê ya ji bo jinan xweser vekir. Ev, yekem dibistana Jinên Kurd bû. Ji bo alîkariya Komara Mihabadê ya di 1946’ê de hatî damezirandin xebitî. Paşê neçar bû biçe Îranê. Hafse Xana Neqîp her tim bawer kir ku, mirovatî di xetekî mirovperwerde dikare biguhere-veguhere. Hafse Xana Neqîp, yek ji nûnera çanda jinê ya dema xwe bû. Ji bo nasnameya xwe ya cins û nîjadî têkoşîn dida, bawer dikir ku divê hemû mirov li gor mafên xwe yên gerdûnî yên ji dayîkbûnê ve tên bijîn, wekhev nêzî mirovên ji her gelî dihatin dibû. Hafse Xana Neqîp ji ber nexweşiya penceşêrê, di 15’ê Nîsana 1953’ân de jiyana xwe ji dest da.

### Ji Rojhilatê Kurdistanê

Qedem Xêr jinek e dilawer, xweşik û têgihiştî bû. Di şerên qebîleyan de ji zilamên qebîleya xwe re pêşeng û piştevanî dikir. Dem bi dem, dema ku qebîleya wan rastê êrîş û dorpêça dijmin dihat, ew Qedem Xêr bû ku bê tirs di nav agir û dengê tifingên dijmin de ji bo rizgar kirina qebîleya xwe erzaq û alavên leşkerî digihand û gelek caran jî ev tevgera wê ya wêrek dibû sedem ku herkes jê hêz bigire.
Qedem Xêr yek ji wan jinane ku di rêveberiya dewletê de cih digire û xwedî rol û mîsyoneke girîng e. Li Loristana ku dikeve bakurê Kurdistana rojhelat di demeke kin de nav û dengê wê bi dilawerî, wêrektî û cengawertiyê belav dibe. Qedem Xêr cihê birayê xwe digire û ji bo ku li dijî Şahê Iranê şerê azadîxwaziyê bide meşandin, ji artêşê re rêbertî dike. Weke vî şerî di gelek şeran de serkeftinên mezin bidest dixe. **Didome…**

---

Akademiya Jîneolojî

## Navlêkirin û Hişmendiya Civakê

**İsyan Karadeniz**

Ji destpêka mirovahiyê ve, herdem pirsek hebû, ew pirs di nava demê de zivirî lêpirsînan û lêpirsîn jî dan li pey lêgerînan… Jiyan! Ji mîtolojiyan heta olan, ji felsefê heta zanistan, hemû rêbazên fikirandinê dan pey wê pirsê û li gorî fêmkirina xwe şîroveyan pêşxistin. Hinekan gotin ax, hinekan gotin av, hinekan gotin madde, hinekan gotin enerjî, hinekan gotin xweza, û hinekan jî gotin Xweda… Ew lêgerînane, lêgervanên heqîqetê di nava deryayên zanabûn û îmtîhanan de gerandin lê di dawî de herdem bersiveke derket pêşberî wan, ‘’Tu li çi digerî, di xwe de bigere û bizivire cewhera xwe.’’ Lê cewher li ku bû? Ew hebûna bêhempa ya mirovahiyê çawa pêşket, li ku derê mezin bû, li ku derê serkeftinên jiyanî qezenc kir û kengê-li ku derê wenda kir. Heta ku ew pirsana rast neyên bersivandin, lêgerîna heqîqetê jî dê nîvî bimîne. Ji bo lêgerîneke rast, berê xwe zivirandina hebûna kok pir girîng e. Em qasî ku şaneya kok fêm bikin, ewqasî dikarin dîroka xwe, îroya xwe û pêşeroja xwe fêm bikin, tehlîl bikin, pêşbînî bikin.
Dema ku em nav li tiştekî dikin; ev nav dimîne jî dîrokê re, ev dibe nasname, çand û hebûn. Dema nav dibe sembol, dibe rênişan; êdi bi vê awayî tê nasîn, teşe digre dibe xwedî can û rih. Di dîrokê de gelek têgîn û têgeh hene ku pêwîst e ji nû ve were destgirtin û şirovekirin.
Di rastiyê de kîjan peyv temîlê me dike; kijan li ser me hatine ferzkirin? Yê eslî/xwezayî û yê çêkirî/ne xwezayî çi ne; em çawa dikarin wana ji hev derxin? Di vê aliyê de heger niyetek me ya lêgerîna heqîqetê hebe pewîst e em vegerin dirokê û şaristanî wek şeklê hatiye nivisandin na; bilaksê vê binerin; rastiyan di tersê şaristaniyê de bibînin da ku yê rast û derew karibin ji hev derbixin. Heger em biçin dîrokê jî destpeka mirovahî heta niha çi tişt bi çi awayî dest guhertiye; em di mitolojiyan de, di çîroka her peyvekî de dikarin bibînin. Werin em bi hev re hin analizên bi çavê Jineolojiyê bikin.
Civakbûna yekem a bi şêwaza kilan jiyankirina mirov li dora jin-dayikê pêş ket. Gelo çi hebû di nava vê civakê de, jiyan çawa diherikiya? Peyva yekem, stran, nivis, amûrên destpêke ji bo çi, bi çi awayî derketin holê? Sedema ku mirov gelek zindiyan cudatir dike lêgerên xwe ya wateye ku bûye rênîşana jiyana mirovahiyê. Dema ku em rûpelên dîrokê dinerin tiştên hatiye nivîsandin de kêmbûyînek hîs dikin, tiştên ku hatine xêzkirin têrê nake û em dikevin nava lêpirsînê ku çi kêm e. Gelo çi kêm e? Destgirtina dîrokê wek xetekî duz tenê ji bo xapandina mirovan hatiyeçêkirin. Çima? Ji ber ku heger tu girêdanbûna xwe ya bi hezar salên berê di hişê xwe de zindî bihêle; koletiya ku were ferzkirin tuyê ti caran qebûl nekê. Di kêliyê de asêkirina mirovan bi armanca xizmetkirina pergalê ye. Yên ku xwestine vê rastiyê derbixin holê jî ji aliyê qetilên qastik ve bi şewazên hovane hatine qetilkirin wekê Hypatia, Bruno, Hallac-ı Mansur; da ku yên din bidin tirsandin. An jî hatine reşkirin da ku kesek nebe şopdarên wan. Mina Manî ku îro peyva manyak (bi Kurdî dibe yên ne xwedî hîş/kêm aqil) carna ev jî têr nekir jî dîrokê hatine mesihandin mîna gelek jinên şifager, zana û jinên pêşeng...
Niha gelek peyv hene ku wateyên wan di xwezaya civakî de bi şêwazekî dihat destgirtin lê niha bi şêwazekî din tê nirxandin. Em dikarin mînakekî bidin, di xwezaya civakê de dayik ne tenê jinê ku zarok aniye dinyayê ye; ev tenê aliyê vê ya biyolojîk e. Dayiktî heman demê çavkaniya xweza, afirandin û berhemdayînî ye. Gelo tesadufe ku peyva Amargi jî cara yekem di tabletên Sumeran de şûna azadî di nexşendina xwe de jî wek jin- çiya- jinên di kabileyên çiyayî hatiye xêzkirin û di wateya xwe de jî wek vegera dayik hatiye pênasekirin? Durketina ji dayikê durketina ji xweza, xwebûn, mirovbûne ku îro herî zêde bûye sedema aloziyên civakî.

---



# Li Îranê ji ber rewşa şer gelek karker ji kar hatin sekinandin

Ji ber şerê dawî yê di navbera Îran û DYA-Îsraîlê de, li Îranê karker û karmend bi awayekî rasterast hem nerasterast rastî pêlek jikarderxistinên girseyî, hatine.

**Navenda Nûçeyan**

Îran şahidiya pêlek bêhempa ya jikarderxistina karker û karmendan di gelek sektoran de bûye, ku di encamê de aloziyên aborî û ewlehiyê derxistiye holê herwiha bi awayekî rasterast bandor li ser bazara kar û hilberînê kiriye.
Li gorî daxuyaniyên dezgehên medyayê yên navneteweyî, di nav de BBC ya Birîtaniyayê, rayedarên Îranî piştrast kirine ku di van demên dawî de bi milyonan kes ji ber rawestandina hilberînê li hejmarek kargeh û kompaniyên girîng, herwiha kêmbûna çalakiyên bazirganî û xizmetguzariyê li welêt, bêkar mane.

### Jikarderxistin li sektorên sereke yên aborî belav dibe

Bandorên krîzê tenê bi sektorekê ve sînordar nebûn, lê belê bandor li sektorên berfireh ên wekî, bazirganî, sektora dîjîtal herwiha kampaniyên hawirdekirin û hinardekirinê jî kir.
Sektora erebeyan, ku yek ji mezintirîn sektorên li Îranê ye, jî bandor dibe. Li gorî texmînan nîşan didin ku rasterast û nerasterast nêzîkî milyonek kes tê de dixebitin û di çend qonaxên rêze hilberînê de ji kar hatine derxistin.

### Bandorên nerasterast li ser bazara kar

Ji bilî girtinên rasterast, krîz gihaşt kampaniyên ku bi sektorên bandordar ve girêdayî ne, wekî



dabînkerên madeyên xav û kampaniyên lojîstîkê, ku ev yek bû sedema pêla duyemîn a windakirina karan.
Berpirsyarên pîşesaziyê destnîşan kirin ku astengiyên rêze dabînkirinê, nemaze ji ber qedexeyên li ser navîgasyonê li hin rêyên deryayî, di hawirdekirina madeyên bingehîn de bûye sedema zehmetiyên girîng û hin kargeh neçar mane ku hêza xwe ya kar kêm bikin an hilberînê rawestînin.

### Kêmbûna xerckirinê û guhertina şêwazên jiyanê

Krîza aborî di reftara xerîdaran a li Îranê nîşan dide, ku xerckirin bi awayekî mezin kêm bûye û di gelek rewşan de tenê bi kelûpelên bingehîn ve sînordar bûye, ku bandorek neyînî li ser sektorên wekî geştiyariyê, xwaringehan û firotanê kiriye.
Kêmbûna tevgerên aborî bûye sedema nîşaneyên civakî yên balkêş, di nav de kêmbûna di veguhastina giştî û qerebalixiya trafîkê de, ku hin kesan ev yek wekî nîşaneya kêmbûna çalakiyên aborî yên rojane hesibandine.

### Sektora dîjîtal di çembera bandorê de ye

Li gorî daxuyaniyên fermî, sektora teknolojiyê jî rastî astengiyên mezin hatiye, nemaze ji ber ku di hin demên diyarkirî de ji ber sedemên ewlehiyê sînorkirinên înternetê têne ferzkirin.
Van sînordarkirinan bandor li ser kampaniyên dîjîtal û karsazên ku xwe dispêrin platformên elktronîk di warê kirîn û frotinê de kiriye, ku bûye sedema kêmbûna çalakiyê di sektora ku di salên dawî de mezinbûnek rêjeyî jiyan dikir.
Herwiha li gorî texmînên aborî nîşan dan ku ji ber qutbûnên înternetê yên dubare, xizmetguzariyên dijîtal û karê ku xwe dispêrin dansûstendina elktronîk hatin asteng kirin, lewma di encamê de zirar û xisareke mezin gihşt aboriya Îranê.

### Medya û saziyên xizmetguzariyê ji krîzê bandor dibin

Dezgehên medyayê jî ji bandorên vê rewşê bêpar neman, li gorî hin raporan hat destnîşan kirin ku hejmarek karmendên hin dezgehên medyayê yên herêmî ji kar hatin derxistin, an jî li şûna karê daîmî ji bo karên serbixwe hatin veguhastin.
Ev zexta darayî ya ku gelek sazî ji ber kêmbûna dahatan û zêdebûna lêçûnên xebitandinê pê re rû bi rû dimînin, nîşan dide.

### Tedbîrên hikûmetê ji bo kontrolkirina krîzê

Ji bo kêmkirina bandorên krîzê, rayedaran bernameyên piştgiriya darayî ji bo karsaziyên piçûk û navîn ragihandin, di nav de deynên ku armanca wan parastina kar e. Lêbelê, ev bername bi rêjeyên enflasyonê yên bilind re rû bi rû dimînin, ku li gorî daneyên fermî ji sedî 50 derbas bûne.
Di heman demê de raporên aborî nîşan didin ku berdewamiya rageşiyên leşkerî an jî dorpêçên navneteweyî dikarin rewşa aborî hîn aloztir bikin û bibin sedema zextek mezintir li ser bazara kar.

### Aborî di bin zexteke mezin de ye

Windakirina kar bi kêmbûna nirxa diravî û bilindbûna buhayê kelûpelên bingehîn re hevdem bû, ku di encamê de hêza kirîna welatiyan kêm kir û zextên jiyanê zêde kir.
Pisporên aborî dibînin ku krîza heyî ne tenê bi bandorên leşkerî ên rasterast ve girêdayî ye, lê di heman demê de bandora xwe li ser avahiya aboriya Îranê jî dike, ku ji ber şer, dorpêçan û astengiyên bazirganiya navneteweyî êş dikşîne.

### Pêşerojeke nediyar

Di çarçoveya aloziyên berdewam de, rewşa aborî ya Îranê ne diyar e, eger krîza heyî bêyî çareseriyên siyasî an jî kêmkirina aloziyên leşkerî berdewam bike, dibe ku bêkarî û rêjeya enflasyonê zêde bibe.
Herwiha çavdêr hişyarî didin ku girtina berdewam a hin rêyên bazirganiyê an jî têkçûna rêzên dabînkirinê dikare bibe sedema kêmbûnek din a hilberîna pîşesaziyê, ku ev yek dê rasterast bandorê li ser astên jiyanê bike.
Pêla ji kar derxistinê li Îranê bandora kûr a aborî ya nakokiya herêmî nîşan dide, ku bandorên wê ji sektorên mezin ên pîşesaziyê bigire heya xizmetguzarî, teknolojî û medyayê dirêj bû.
Ji ber faktorên leşkerî û aborî yên bi hev re, xuya ye ku bazara kar a Îranê bi qonaxeke ji nû ve avakirinê ya dijwar re rû bi rû ye, dibe ku bandorên wê bi salan berdewam bikin ger herêm pêşketineke siyasî û ewlehîyê nebîne ku aramiyê ji bo tevgera hilberîn û bazirganiyê vegerîne.

---

# Projeya sînorkirina desthilata Trump di şerê li dijî Îranê de hat têkbirin

**Navenda Nûçeyan**

**Projeya ku Kongrsa Amerîkayê ji hêla demokratan ve, ji bo sînorkirina şiyana Dolnad Trump di şerê li dijî Îranê de pêşkêş kiribû, hat têkbirin.**

Ev hewldana pêncemîn a Demokratan di Meclisê de ye, ji bo derxistina biryarnameyekê ku desthilatên Trump di şerê li dijî Îranê de sînordar bike. Lê di encama dengdana projeya ku Konrsê pêşkêş kiribû, 51 deng ev proje red kir û 46 deng erê kir.
Biryar dê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê neçar bikira ku hêzên xwe ji şer vekişîne heta ku Kongres rê hin tedbîran bigre. Serokê Demokratên Senatoyê Chuck Schumer got ku Trump her ku dirêjtir li benda derxistina Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê ji vî şerî bisekine, rewşa aloz û kûrtir dibe û derketina wê jî dijwartir dibe.
Dengdan piştî rojekê ji raghandina Trump a agirbesta bi Îranê re heta ku pêşniyarek ji aliyê Îranê ve were pêşkêşkirin û danûstandin bi dawî bibin, dê were dirêjkirin, hat.
Trump di postek li ser “Truth Social” de zelal kir ku ev biryar li ser daxwaza Pakistanê ya ji bo paşxistina êrişan hatiye dayîn. Trump zêde kir ku hêzên çekdar dê dorpêçê bidomînin û dê amade bin ji bo ku bersivê bidin di heman demê de tekez kir ku di derbarê agirbestê an destnîşankirina demekê ji bo danûstandinan bi Îranê re de tu zextek demê tune ye, herwiha destnîşan kir ku raporên li ser dirêjkirina sê heta pênc rojan a agirbestê ne rast in.




Trump di derbarê bûyerên dawî yên li Tengava Hurmuzê de piştrast kir ku keştîyên ku hatine desteserkirin ne Amerîkî ne herwiha destnîşan kir ku dorpêçkirin ji bombebaranê zextê li ser rejîma Îranê zêdetir dike.

# Ji bo parastina ewlehiya welatiyan Trafîkê tedbîrên nû ragihandin

Ji destpêka sala 2026'an ve, ji ber binpêkirina zagonên trafîkî li kantona Cizîrê nîzê 250 qezeyên trafîkê çêbûne. Ji bo parastina jiyana welatiyan, rêxistinkirina rê û pêkanîna zagonan rêveberiya Trafîkê tedbîrên nû girtin.

**Stêrk Mihemed**

Ji serê salê ve li kantona Cizîrê nêzî 250 qezayên Trafîkê çêbûne, di çarçoveya pêkanîna peymana 29'ê Çileyê de Rêveberiya Giştî ya Trafîkê ya parêzgeha Hesekê ragihand ku ew ê ji bo parastina jiyana welatiyan û kêmkirina qezayên trafîkê, li ser hemû rê, dever û navçeyên parêzgehê, dest bi pêkanîna hin qanûnên tirafîkê yên berferh bike.



**Tedbîrên trafîkê bi vê rengî ne:**

**1- Qedexekirina bikaranîna fêmê:**

Danîna her cure fêmê ya pencereya tarî li ser erebeyan qedexe ye. Polîsên trafîkê wê fêmê yekser radikin. Kesên ku dubare binpê dikin dê wesayîtên wan werin desteserkirin û wê tedbîrên yasayî li ser wan were sepandin.

**2- Sererastkirina rewşa qanûnî ya erebeyan**

Xwediyên erebeyên bêqeyd heta dawiya vê mehê dem li pêşiya wan heye ku erebeyên xwe qeyd bikin û rewşa qanûnî sererast bikkin. Piştî vê demê, wê hemû tedbîrên qanûnî yên hişk werin girtin, her erebeya ku bê qeyd be wê were desteserkirin.

**3- Plakeya nimirê erebeyan**

Tevgera erebeya bê plake an jî bi karanîna plakayên sexte qedexe ye. Her kesê ku di binpêkirinek wisa de were girtin wê yekser cezayê pere, desteserkirina erebeyê û dozgeriya qanûnî lê were vekirin.

**4- Leza ajotinê li gorî qanûnê ye**

Divê di nava bajaran û riyên giştî de leza erebeyan li gorî pîvanên ku hatine diyarkirin be, ji ber leza zêde xetere li ser jiyana şêniyan û kesên ku erebeyan bileza zêde bajo wê were cezakirin.

**5- Amûrên ronahî û deng yên qedexekirî**

Sazkirin û bikaranîna şewqa zîno ku dibin sedema aciziyê li cem ajokarên din, qedexe ye. Dengê sîrenên polîsan jî qedexe ye. Kesên ku van amûran bi kar bîne wê yekser amûr werin desteserkirin û xwediyên wan wê cezayên giran li wan were birîn.

Di vê çarçovê de Rêveberiya Trafîka bajarê Qamişlo Sîpan Bedir ji Rojnameya me re axivî.

Sîpan Bedir diyar kir ku ev 4 rojin wan dest bi kampaniya rêxistina bajaran di milê trafîkî de kirî û wiha got: "Rêveberiya Gîştî a Trafîka Parîzgeha Hesekê ji bo ewlehiya welatiyan, rêxisrinkirina rê û pêkanîna zagonan perspektîvên nû raghandin, li ser vê esasî hêzên trafîkê û bi hemehengiya hêzên ewlekariya hundirîn, dest bi kampaniya dispilîna bajaran kirin. Bi taybet di milê danîna fêmê li ser erebeyan gelek pirsgirêkên weke dizî û êrişan derdixe û dema ku fêmî li ser erebayan hebe kemîra nikare kesên ku di erebayan de ne nas bike. Di heman demê de ew kesên ku erebeyan wan bê nimre ne gelek pirsgirêkan derdixin û terzê erebê tê naskirin, lê eger nimre ne sîwarkirî be misogerkirina ew kesê socdar zehmet dibe. Di heman demê de şewqê zîno di dema dawî de gelek zêde bûne û dibin sedema gelek qezayan. Ji dema destpêkirian vê kampaniyê de em van tedbîran pêk tînin û em ê berdewam bikin. Ji bo vê jî û ji bo misogerkirina ewlehiya welatiyan û pêkanîna zagonan em hêvî dikin ku ajokar û welatî bi me re alîkar bin û destek bidin endamên trafîkê."

# 23'ê Nîsana 1920'an

**Volqan Elî**

Serenivîsa li jor ne tenê serenivesek e. Bi gelek taybetmendiyên xwe, ji gelek aliyan ve cuda tê nirxandin. Hin kes wekî cejnekê digirin dest, hin hêzan wekî dîrokek nebaş girtine dest (wê demê împ-Osmanî)… her çi tiştbe, di encamê de mirov dikare wekî werçerxanekê lê mêze bike. Yanî dîrokek girîng e. Piştî şerê cîhanê yê yekemîn, yan jî bi teslîmbûna Împ. Osmanî, şerê cîhanê yê yekemîn, bi muterekeya Mondrosê bi encam bû, Mistefa Kemalê ku generalekî vê împaratoriyê bû, berê xwe da Anatolî û Kurdistanê. Ew bi xwe jî wezîfedarekî padîşahê Osmanî Vahdettin bû. Erka wî ya fermî ku ji împaratoriyê girtibû; ew dê biçûya Anotolî û Kurdistanê, nehîştana ku artêşên Osmanî li ber teslîmbûnê serî hilde.

M. Kemal piştî ku ji padîşah ev wezîfe wergirt di demeke kurt de xwe di ser Behra Reş re xwe gihand cebheyên artêşa Osmanî ya têkçûyî. Dît ku bi rastî jî halê artêşê ne ti hal e. Ne serhildana li dijî teslîmiyetê, berewajî bi temamî şikestiye û têkçûye. Nayê zanîn ku di vê kêliyê de fikra esasî ya M. Kemal çi bû ye lê piştî vê dîmenê dibîne, dibe xwediyê helwesteke wisa: 'dibe ku artêşa têkçûyî ya Osmanî û gelên Anatolî û gelên Kurdistanê li dijî dagirkeriya Ewrûpiyan were birêxistin kirin'. Lê belê ji ber têkçûyînê, ji artêşa Osmanî yan jî gelên din ên Anatoliyê zêde derfetên berxwedanê peyda nake.

Dawiya dawî wekî hevkariyên dîrokî ya Melezgîr û Çaldiranê xwe diavêje ber berxtê eşîrên Kurdan. Piştî gerugeşteke durûdirej a din av eel uu eşiireen Kurdan de civîn û kongreyên Erzerom, Sêwas û Tamîma Amasyayee destek ji Kurdan werdigire ku li dijî dagirkeriya Îngîlîz û Fransiyan şer bimeşînin û dawî li dagirkeriyê bînin. Bi rastî jî li ser vê esasê ji beriya 23'ê Nîsana 1920'an destpêkê bi lehengiya gelê Kurd Riha û derdora wê, ji dagirkeriya Fransî hatiye rizgarkirin. Dîsa 12'ê Sibata 1920'an de Mereş û derdora wê ji dagirkeriya heman hêzê xelas bûye. Piştî van berxwedanên mezin e ku hêdî hêdî M. Kemal Enqereyê ji xwe re dike payitext û bingeha artêşa xwe datîne. Li peravên rojava û başûrê Anatoliyê jî li dijî dagirkeriya Yewnan û Îtalî, zayif jî bibe şerekî dide meşandin. Hê bêhtir dijminê ku li Kurdistanê li eniyên Riha, Mereş têk diçe, êdî ji serkeftina li beramberê gelên Anatoliyê bê hêvî dibe. Ji ber vê yekê ye ku hêdî hêdî, dagirkeriya Îngîlîz desteka xwe ji Yewnaniyan dikişînin. Lewra M. Kemal serkeftinên xwe yên li Anatoliyê jî deyndarê gelê Kurd e. Naxwe, eger Îngîlîzan desteka xwe ji Yewnaniyan nekişandana artêşa Yewnanî ku hatibû li ber sînorên Enqereyê, dikarîbû wê derê bi rehetî dagir bike!

Werhasilî bi hêz, moral û motivasyona ku M. Kemal ji serkeftinên Riha û Mereşê wergirtibû, (bi desteka eşîrên Kurd û gelên Anatoliyê) li Enqereyê di dîroka 23'ê Nîsana 1920'an de Meclisa Gel A Mezin ava dike. Kurd bi eşîreîs, rewşenbîr û wêjevanên xwe, bi çand û edet û teqalîdên xwe di vê Meclisê de cihê xwe digirin. Wesa ku piştî bi demeke diyar dagirkeriya Fransî li herêma Dîlokê jî, bi pêşengiya lehengên wekî Qere Yilan û Şahîn Beg, têkçûye destê M. Kemal dê bi temamî bi hêztir bûya. Nuxteya herî balkêş ew e ku ev berxwedanên heremî bi temamii ji aliyê gelên herêmê ve hatiye meşandin.

Çendî balkêş û sosret e ku ji herêma Qoçgîriyê (Sêwas) û herêmên din ên Kurdistanê rûspiyên Kurdan di vê Meclisê de cihê xwe wergirtibûne. Herwisa li ser vê kevneşopiya Meclisa destpêkê di 23'ê Nîsana 1921'an de ji aliyê vê saziyê ve Makezagona Destpêkê ya Tirkiyeyê tê çêkirin. Di vê navberê de Kurdên herêma Qoçgîriyê bi daxwaza xweseriyê, dema ku di xwestekên xwe de israr dikin ji aliyê artêşa M. Kemal ve bi şer û şidetê ve rû bi rû dimînin. Lê li ber xwe didin. Nêzîkî 200 gundên Kurdan tên şewitandin. Di encamê de ev berxwedan tê tepisandin. Lê M. Kemal hewl dide, piştii ji berxwedanee zêde bi tûndî neçe li ser pirsgirêkê. Ji derveyê Elîşêr Efendî hemû pêşengên vê berxwedanê efû dike û hin kesan di xebatên vê Meclîsê de erkdar jî dike.

Bi gotinên fîlozofê çiyayan Qasim Engin "Elîşêr ne tenê rêberekî gelê Kurd e, ew di heman demê de wêjevan û dîplomatekî bijarte yê gelê Kurd e". Di van bûyerên dawî yên mezin de xala girîng çi ye? Tevî şer û şîdeta li dijî gelê Kurd jî (herêma Qoçgîrî), M. Kemal têkîliyên xwe û gelê Kurd ji binî de qut nake. Bi nermî nêzîkî pêşengên vê berxwedanê dibe. nêzîkbûna herî dijwar ji bo pêşengên berxwedanê, piştî ji berxwedanê Elîşêr surgînî Dêrsimê dike. Heta ev helwesta M. Kemal di vê makezagona (Qanunini Esasi) ku di dîroka 23'ê Nîsana 1921'an de hatiye çêkirin de didome. Gelek madeyên vê makezagonê, bi şiklekî xweseriya Kurdan, xweseriya kêmnetew uu baweriyên cuda qebûl dike. Heta vê dîrokê destkariya emperyalîzma Ewrûpî li beramberê berxwedana bi pêşengiya M. Kemal ku desteka gelê Kurd û gelên Anatoliyê wergirtibû çênabe. Jixwe Fransî, Îtalî û Yewnanî û Îngîlîz bi xwe aliyekî şer bûn, têra xwe li dijî M. Kemal û beriya wê jî li dijî Osmaniyan şer kiribûn. Lê belê piştî vê di serî de emperyalîzma Îngîlîz, û bi giştî jî modernîteya kapîtalîst vê îhtimala xwîşk û biratiya gelan ku li Anatolî û Kurdistanê bi pêşketiye ji xwe re bi xeterî nirxandiye. Di serî de Îngîlîzan, di gelek têkîliyên dîplomatîk de (peymana Lozan û hwd) bi Komara M. Kemal daye fêmkirin ku eger ew van têkîliyên xwe yên bi Kurd û baweriyên cuda re xelas neke, û hê jî bi pêşde biçe, ew ê Tirkiyeya wê demê ku di destê M. Kemal de bû bikeve xetereyê. Ji lewra di makezagona Komara Tirkiye ku di 1924'an de hatiye çêkirin, û di hin helwestên Komarê yên din de hemû sozên ku M. Kemal û komarê ji bo Kurd û bawerî û gelên cuda hatine dayin hatine ji bîrkirin.

Gelê Kurd li beramberê vê komploya modernîteya kapîtalîst bê helwest nemaye. Lê sed mixabin e ku encax kariye bi avakirina rêxistina Azadî bersiva vê êrîşa giran bide. Dema ku bi komployên cuda pêşengên vê rêxistinê yên wekî Xalid Cîrbranî, Yusuf Ziya hatin bêbandorkirin herî dawî jî bi komployekê, bi şiklekî berwext serhildana gelê Kurd hatiye teqandin. Şêx Seîd efendî ji neçarî serhildana berwext bi rêvebiriye. Lê negihîştiye çend mehan, bi temamî bi trajediyeke mezin bi encam bûye. Di dawiya dawî de eniya gelan ku wekî xewneke xweş xwe pêş gelên Kurdistan û Anatoliyê kiribû, li wan bûye xewnereşikekê.



# Li Herêma Kurdistanê 647 êrîş pêkhatin: 123 qurbanî

Rêxistina Avakirina Aştiya Civakê ya Amerîkayê ya li Kurdistanê-Iraqê (CPT) raporeke nû derbarê êrîşên di pêvajoya şerê DYE-Îsraîl û Îranê de li ser Herêma Kurdistanê pêkhatine, belav kir. Di encama van êrîşana de 22 kes jiyana xwe ji destdan û 101 kesên din birîndar bûn.

**Navenda Nûçeyan**

Rêxistina Avakirina Aştiya Civakê ya Amerîkayê ya li Kurdistanê-Iraqê (CPT) raporeke nû derbarê êrîşên di pêvajoya şerê DYE-Îsraîl û Îranê de li ser Herêma Kurdistanê pêkhatine, di 24'ê Nîsanê de belav kir.

Rêxistina Avakirina Aştiya Civakê ya Amerîkayê ya li Kurdistanê-Iraqê, bîlançoya êrişên li ser Herêma Kurdistanê bi raporekê eşkere kir, naveroka raporê wiha bû: "Di nava 40 rojan de, artêşa Pasdarên Îranê û komên hevpeymanên wê li Iraqê 647 êrîş pêkanîne û di van êrîşan de 123 kes li Herêma Kurdistanê bûne qurbanî, 22 kesan jiyana xwe ji dest dane û 101 kesên din jî birîndar bûne, ji vê hejmarê giştî 24 kes welatiyên sivîl bûn. Piştî di 28'ê Sibata 2026'an de destpêkirina şer û êrîşên hevbeş ên Amerîka û Îsraîlê li ser Îranê, Herêma Kurdistanê ji aliyê artêşa Pasdarên Îranê û komên ser bi Îranê yên li Iraqê, rastî bi sedan êrîşên balafirên bê mirov û mûşekan hat. Ango ji destpêka şer heta ragihandina agirbestê di 7'ê Nîsanê de, 647 êrîş li ser Herêma Kurdistanê hatin kirin. Tevî ragihandina agirbestê jî, Îran û komên girêdayî wê li Iraqê êrîşên xwe yên li ser Herêma Kurdistanê berdewam kirin û ji 8'ê Nîsanê heta 24'ê Nîsanê, 48 êrîşên din pêkanîn. Bi vî awayî ji destpêka şer heta niha 695 êrîş li ser Herêma Kurdistanê hatine kirin. Di dema agirbestê de, kamp û baregehên partiyên Kurd ên Rojhilatê Kurdistanê yên li Iraqê armancên sereke yên êrîşan bûn. Li gorî beriya agirbestê, piraniya êrîşên niha rasterast ji aliyê Îranê ve hatine kirin.

**Êrîşên ji 28'ê Sibatê heta ragihandina agirbestê (8'ê Nîsanê):**

Artêşa Pasdarên Îranê û komên girêdayî wê, di nav çil rojên şer de (ji 28'ê Sibatê heta 8'ê Nîsanê), 647 êrîş li ser Herêma Kurdistanê hatiye kirin. Piraniya êrîşan li ser konsolxane û baregehên leşkerî yên Amerîkayê bûn ku 277 caran êrîş hate kirin. Baregehên Wezareta Pêşmerge ya Hikûmeta Herêma Kurdistanê, cihên sivîl, zeviyên neftê û parzûngeh, kompanyayên ragihandinê, saziyên sivîl û leşkerî yên ku beşdarî şer nebûne, di rêza duyem de bûn û 224 caran bûn armanc. Kamp û baregehên partiyên Kurd ên Rojhilat li Herêma Kurdistanê di rêza sêyem de bûn û 146 caran bûn armanca êrîşan. Artêşa Pasdaran berpirsyarê ji sedan 31.8'ê van êrîşane û komên girêdayî wê jî ji sedan 68.2'ê êrîşan pêkanîne. Herwiha ji sedan 42.8'ê êrîşan li ser saziyên dîplomatîk û leşkerî yên Amerîkayê yên li Herêma Kurdistanê bûn.




**Êrîşên di dema agirbestê de (8 Nîsanê heta 24'ê Nîsanê):**

Piştî ku di 8'ê Nîsanê de her du aliyên şer agirbest ragihandin û danûstandinên li Îslamabadê destpê kirin, dihat hêvîkirin ku êrîşên Îranê yên li ser Herêma Kurdistanê jî bisekinin û agirbest Herêma Kurdistanê jî bigire nav xwe. Lê Artêşa Pasdarên Îranê û komên girêdayî wê li Iraqê êrîşên xwe berdewam kirin. Di dema agirbestê de, Herêma Kurdistanê rastî 48 êrîşan hatiye. Ji vê hejmarê, Artêşa Pasdaran ji sedan 75'ê êrîşan pêkaniye û komên girêdayî wê yên li Iraqê jî ji sedan 25'ê êrîşên di dema agirbestê de pêkanîne. Ev yek nîşan dide ku li gorî beriya ragihandina agirbestê, piraniya êrîşan rasterast ji aliyê Artêşa Pasdaran ve hatine kirin. Di dema agirbestê de, piraniya êrîşan li ser baregehên partiyên Kurd ên Rojhilat bûn ku 37 êrîş hatin pêkanîn û ev jî ji sedan 77.1'ê tevahiya êrîşan pêktîne. Baregehên Wezareta Pêşmerge ya hikûmeta Herêma Kurdistanê û cihên sivîl 7 caran hatine bombebaran kirin ku ev jî ji sedan 14.6'ê êrîşan bû. Di dema agirbestê de, herî kêm êrîş li ser saziyên dîplomatîk û serbazî yên Amerîkayê hatine kirin ku tenê 4 êrîş bûn û ji sedan 8.3'ê tevahiya êrîşan pêktîne. Ev jî wê rastiyê derdixe holê ku baldariya leşkerî ya Artêşa Pasdaran di dema agirbestê de, ji armanc girtina saziyên Amerîkayê guheriye ber bi armanc girtina baregeh û kampên partiyên Kurd ên Rojhilat ên li Herêma Kurdistanê. Her wiha agirbest û rawestandina şer a di navbera Amerîka û Îranê de, nebûye garantiyek ji bo rawestandina êrîşên Îranê û komên girêdayî wê yên li ser Herêma Kurdistanê.

**Tevahiya êrîşan (28'ê Sibatê heta 24'ê Nîsanê):**

Ji destpêka destpêkirina şer heta niha, 695 êrîş li ser Herêma Kurdistanê hatine pêkanîn. Ji van êrîşan, ji sedan 34.8 rasterast ji aliyê Îranê ve hatine kirin û komên girêdayî Îranê yên li Iraqê jî berpirsê ji sedan 65.2'ê êrîşên li ser Herêma Kurdistanê ne. Ji ber hebûna Konsolosxaneya Giştî û baregehên leşkerî yên Amerîkayê li Hewlêrê û herwiha hebûna herî zêde ya kamp û baregehên leşkerî yên partiyên Kurd ên Rojhilat, piraniya êrîşan li ser sînorê parêzgeha Hewlêrê bûn. Parêzgehên Silêmanî, Dihok û Helebceyê, di warê rêjeya armanc girtinê de di rêzên duyem, sêyem û çarem de bûn.

**Hejmar û rêjeya êrîşan li gorî sînorê parêzgehan:**

-Hewlêr: 544 êrîş – ji sedan 78.3
-Silêmanî: 123 êrîş – ji sedan 17.7
-Dihok: 22 êrîş – %3.2
-Helebce: 6 êrîş – %0.8

Êrîşên bi rêya balafirên bêmirov, mûşek, topbaran û gulebaranan hatine encamdan bi vî awayî ne:
-551 êrîş bi rêya balafirên bêmirov ên xwekuj hatine kirin.
-131 êrîş bi rêya mûşekan hatine kirin.
-12 êrîş bi rêya topbaranê hatine kirin.
-1 êrîş jî bi rêya gulebaranê hatiye encamdan.

**Armancên êrîşan:**

CPT-Amerîka amancên êrîşên Artêşa Pasdarên Îranê û komên girêdayî wê yên li Iraqê yên li ser Herêma Kurdistanê, di sê grûpan de belav kirine. Grûpa yekem; saziyên dîplomatîk û baregehên leşkerî yên Amerîkayê li Herêma Kurdistanê ne. Grûpa duyem; partiyên Kurd ên Rojhilatê Kurdistanê yên ku bi dehan salin li Herêma Kurdistanê ne û di kamp û niştecihên taybet de dimînin. Grûpa sêyem jî; Wezareta Pêşmerge ya Hikûmeta Herêma Kurdistanê, saziyên sivîl û fermî, cihên niştecihbûnê, navendên bazirganî û enerjiyê, malên welatiyên sivîl û ew saziyên ku ne beşdarî şerê Îran û Amerîkayê ne. Hejmar û rêjeya êrîşên li ser van grûpan ji destpêka şer ve bi vî rengî ye:

-Konsulxane û baregehên serbazî yên Amerîkayê: 281 êrîş – ji sedan 40.5
-Saziyên sivîl, cihên niştecihbûnê û aliyên ne beşdarî şer: 231 êrîş – ji sedan 33.2
-Partiyên Kurd ên Rojhilatê Kurdistanê: 183 êrîş – ji sedan 26.3

Ji 695 êrîşên bi balafirên bêmirov û mûşekan, 407 êrîş bi rêya sîstema parastina hewayî, êrîşên balafirên şer yan jî gulebarana rasterast, beriya ku li armancên xwe bikevin, hatine pûçkirin. Ango ji sedan 58.6'ê êrîşan hatine pûçkirin.

**Ziyanên canî û madî**

Ji 28'ê Sibatê heta 24'ê Nîsana 2026'an, di encama êrîşan de 123 kes li Herêma Kurdistanê bûne qurbanî; ji wê hejmarê 22 kesan jiyana xwe ji dest dane û 101 kes jî birîndar bûne. Ji hejmara giştî 24 kes ji qurbaniyan welatiyên sivîl bûn. Ji bilî ziyanên canî, êrîşan ziyanên madî yên mezin gihandine welatiyên Herêma Kurdistanê. Bi vî awayî, ziyan gihîştiye zêdetirî 67 xanî û cihên niştecihbûnê û 45 otomobîlên welatiyên sivîl. Tîma Kurdistana Iraqê ya CPT'yê, biryara dirêjkirina dema agirbestê bi dilxweşî pêşwazî dike. Lê li gel rawestandina êrîşên leşkerî yên aliyên vî şerî li dijî hev, pêwîst e demildest êrîşên Îranê û komên girêdayî wê yên li ser Herêma Kurdistanê jî bên rawestandin. Berpiryartî li ser hikûmeta Iraqê ye ku serweriya xaka Iraqê biparêze û komên girêdayî Îranê yên ku ji Iraqê êrîşî Herêma Kurdistanê dikin, rawestîne. Pêwîste hikûmeta Herêma Kurdistanê û hikûmeta Iraqê di zûtirîn dem de ji bo tezmînkirina welatiyên ku di vî şerî de ziyan dîtine kar bikin. Ev yek jî li gorî yasaya jimara 20 ya sala 2009'an û yasaya jimara 57 ya sala 2015'an a guhertî di Encumena Nûnerên Iraqê de were kirin."

# Entegrasyona demokratîk, civakî, siyasî û leşkerî çi ne?

Entegrasyona demokratîk, civakî, siyasî û leşkerî girîng in ku li ser bingeha demokrasî, wekhevî û rêzgirtina cihêrengiyên çandî, ziman û bawerî ava dibin. Ev entegrasyon armanc dikin ku hemû kes û kom bi awayekî azad di jiyana civakî, leşkerî, siyasî û aborî de beşdar bibin. Entegrasyon diyalog û lihevhatinê xurt dike, pevçûnê kêm dike û rê li ber avakirina civakeke aştî, yekgirtî û dadmend vedike.

**Ronahî Sadûn/Qamişlo**



Têgeha “entegrasyon” bi taybetî ji serdema piştî kolonyalîzmê (istimar) heta îro, hem di stratejiyên siyasî yên dewlet-netewan de, hem jî di têkoşînên azadiyê yên gelan de bi awayeke pirrengî hatiye bikaranîn. Têgeha “entegrasyonê” bi gelemperî behsa beşdarbûna civateke an kesekî-ê di pergaleke heyî de dike. Di bingeha wê de ahengeke civakî, ji cudahiyên hev re rêzgirtin, hevdu qebûlkirin û fikra bi hev re jiyanê, heye. Ev têgeh ji hêla Rêberê Apo ve wekî rêya çareseriyê ya bingehîn di dema Pêvajoya Aştiyê de hatiye destnîşankirin û wekî modelekê tê nîqaşkirin ku armanc dike nasnameyên cihêreng, bi taybetî Kurd, di nav avahiya netewedewletê de li ser bingeha wekhevî û xwebûnê entegre bike.

### Entegrasyona Demokratîk çi ye?

Li gorî pênaseya Rêberê Apo, entegrasyona demokratîk tê wateya yekbûna civakeke demokratîk bi dewletekê re. Ev tê vê wateyê ku li şûna civakek xwe wekî dewleteke cuda birêxistin bike û bi dewleteke din ve girêdayî be, civak wekî civakeke demokratîk tevlî komara demokratîk dibe.

### Çend rêgezên bingehîn ên entegrasyona demokratîk:

1-Entegrasyona demokratîk wekheviyê dihewîne û bi rêya muzakereya demokratîk pêkan e. Muzakereya demokratîk yekbûna civaka demokratîk û dewleta neteweyî misoger dike.

2-Entegrasyona demokratîk dijberî asîmilasyonê ye. Têgeha entegrasyona demokratîk ahengeke li gor vîna civakan,
mînak jiyaneke ku gel bi çand, ziman, nasname û baweriyên xwe bijî û van nirxên xwe biparêze esas digre.

3-Entegrasyona Demokratîk ew formula çareseriyê ye ku gel beyî dewleteke neteweyî avabikin, bi deweletên di nav sînorên wan de dijîn re li ser rêgezên wekhevî û demokrasiye li hev bikin û hevdu qebûl bikin.

### Rêber Apo li ser entegrasyona demokratîk çi dibêje?

Rêberê Apo di nirxandinên xwe de şertû mercên entegrasyonê lêpirsîn dike û di derheqê entegrasyona demokratîk de wiha dibêje: “Siyaseta demokratîk di komareke demokratîk de pêkan e. Ger komar demokratîk nebe entegrasyon pêk nayê, entegrasyon bi komara faşîst re çênabe. Ji ber vê yekê, hevwateya siyaseta demokratîk, Komara Demokratîk e û entegrasyon pê re tê çêkirin.

### Ji bo pêkanîna entegrasyonê hişmediya pêwîst

Bêguman ji bo ku entegrasyon pêk were, destpêkê pêwîstî bi guhertina hişmendiya dewletê heye. Divê dewlet gelên di hundirê sînorê xwe de qebûl bike, ol û baweriyê cuda ji bo hebûna netewedewletê wek tahlûke nebine, lê wek dewlemendiyeke civakî bibîne û bigre dest. Di heman demê de divê dewlet daxwazên civakên cuda qebûl bike, da ku ew civak bi awayekî azad jiyan bikin. Lewra hişmendiya ku di pêşiya van daxwazan de asteng e, divê dewlet biguhere û li dij van mafên bingehîn yên însanî hestiyar be.

### Qanûnên entegrasyona demokratîk

Bêguman ji bo ku entegrasyona demokratîk pêk were û mayînde bibe, li gel hişmendiyeke demokratîk û pirreng pêwîstî bi guhertinên qanûnî jî hene. Ji bo vê jî divê dewlet qanûnên entegrasyona demokratîk û azadiyê derxe. Divê ev qanûn mafên hemû nasnameyên cuda yên xwe bi awayekî azad îfadekirinê, bi çand, ziman û tarzê jiyana xwe xwe rêxistinkirinê erê bikin û bi destûkra bingehîn misoger bikin.

### Xurtkirina rêveberiyên xwecihî

Rêgeza bingehîn a rêveberiyên xwecihî ew e ku erk û berpirsyariya meşandina kar û barên civakî, ji bo pêkanîna van erkan mekanizmaya biryargirtinê ne di destê hukumeta navendî, di destê rêveberiyên xwecihî de be ye. Ev rêgez çanda demokratîkbûnê û polîtîkbûna civakê xurtir dike. Kar û barê hikumeta navendî siviktir dike. Pirsgirêk û pêwistiyên civakê zûtir çareser dike. Rêveberiyên xwecihî polîtîkayên ku pêdiviyên civakan yên manewî, nirxên neteweyî xurt bikin baştir dimeşînin. Ji hikumeta navendî baştir dikarin polîtikayên aboriyê biafirînin, ji bo civakê qadên kar û xebatê avabikin. Bi vî awayî jiyan û civakeke bêtir aram û serkeftî dikare bê avakirin.

### Entegrasyona civakî çi ye?

Entegrasyona civakî pêvajoyeke berfireh e ku armanc dike beşdariya hemû kesan, bi taybetî komên paşguhkirî an koçberan, di jiyana aborî, civakî û çandî ya civakê de pêş bixe û mafên wan ên wekhev misoger bike.

### Girîngiya entegrasasyona civakî:

Bidestxistina hevgirtina civakî û kêmkirina xizaniyê. Hemû kes hezkirina hev du qecen dike û bi vê yekê dighêjin çavkaniyên derbara xwe. Herwiha entegrasyona civakî ji bo pêşxistina aramiya civakî û aborî jî girîng e. Di heman demê de di çarçoveya entegrasyona civakî de mafê wekhev ên her du zanyînan tê misogerkirin.

### ‘Entegrasyona civakî veguherînek bo avakirina neteweyek demokratîk e’

Li gorî Rêber Apo entegrasyona civakî an entegrasyona demokratîk veguherînek ji şerê çekdarî bo avakirina “neteweyek demokratîk” e ku tê de nasname, çand û bawerî di nav yekîtîya dewletê de bi azadî dijîn, bi rêya lihevkirina siyasî, hemwelatîbûna wekhev û avakirina civakê.

### Prensîbên sereke yên entegrasasyona civakî li gorî Rêber Apo wiha ne:

Entegrasyona demokratîk, ne yekîtiya bi zorê: Rêber Apo veqetandinê red dike û banga entegrekirinê di çarçoveya “komara demokratîk” de dike ku mafên hemûyan garantî bike.

Neteweya demokratîk: Têgeheke berfireh e ku ji sînorên etnîkî û olî derbas dibe ku hemû gel û bawerî li ser bingeha wekheviyê beşdarî birêvebirina jiyana xwe dibin.

Hemwelatîbûna Azad: Prensîba bingehîn e ku azadiya takekes û nasnameya wî ya çandî û olî di çarçoveya yekîtîya dewletê de garantî dike.

Qanûnên aştiyê: Tê tekez kirin ku veguherîna bo vê entegrasyonê çarçoveyek qanûnî hewce dike ku aliyên siyasî, civakî, aborî û çandî dihewîne, da ku qonaxên pevçûna neyînî bi dawî bibin.

Diyalog û avakirin: Li şûna rûbirûbûna leşkerî qonaxek avakirina siyasî û civakî ya erênî.

### Entegrasyona siyasî çi ye?

Entegrasyona siyasî pêvajoya yekkirina du an zêdetir saziyên siyasî an îdarî di yek dezgehê de ye (wek yekkirina partî an herêman), yan jî ew pêvajoyek demdirêj e ku armanc dike beşdariya hemû pêkhateyên civakê di jiyana siyasî û civakî de li ser bingeha wekhevî û pirrengiyê misoger bike. Armanca wê xurtkirina wefadariya neteweyî, yekkirina avahiyên siyasî, an lihevhatina civak û dewletê ye.

### Cure û têgehên entegrasyona siyasî:

Yekbûna partiyan: Yekbûna du an zêdetir partiyên siyasî bo partiyeke nû.

Entegrasyona demokratîk: projeyek mirovî-civakî li ser bingeha jiyana bi hev re ya dilxwazî, wekhevî û cihêrengiya çandî, dûrî helandina nasnameyan.

Entegrasyona neteweyî (entegrasyona civakî û siyasî): Pêvajoya xurtkirina wefadariya neteweyî li ser wefadariyên binî.

Entegrasyona saziyî: Yekbûna saziyên îdarî (şaredarî, parêzgeh) di nav yek dewletê de.

### Cûdahiya di navbera entegrasyon û hevgirtinê (entegrasyona bi zorê) de:

Entegrasyona demokratîk: Di heman demê de beşdarbûn û jiyana hevbeş pêk tîne dema ku nasnameya çandî û pirrengiyê diparêze.

Siyaseta asîmîlasyonê: Pir caran behsa hewldanên “helandin” an jî jihevdexistina nasnameyên kêmneteweyan an koman di nav nasnameya piraniya serdest de dike.

### Armancên entegrasyona siyasî:

Beşdarbûna wekhev, bidestxistina aramiyê û xurtkirina rawabûnê.

### Xalên sereke yên entegrebûna siyasî li gorî Rêber Apo:

Veguhestina stratejîk: Derbasbûna ji qonaxa tundûtûjî û pevçûna neyînî ber bi “qonaxa avakirina erênî.”

Komara Demokratîk: Pejirandina “Komara Demokratîk” wekî çarçoveyek referansê, garantîkirina yekîtîya dewletê di heman demê de naskirina azadiya nasnameyan.

Hemwelatîbûna azad: Balkişandina ser “hemwelatiyê azad” wekî kevirê bingehîn ê pêvajoya siyasî.

Qanûnên aştiyê: Veguhêz bi tenê bi bêçekkirinê ve sînordar nîne, lê “qanûnên aştiyê” hewce dike ku aliyên siyasî, civakî, aborî û çandî di nav xwe de bigirin.

Diyalog û siyaset: Li şûna operasyonên leşkerî, pjirandina diyalog û siyasetê wekî rêyek ji bo çareserkirina pirsgirêkan.

Çareseriyeke demokratîk a berfireh: Entegrasyon nayê wateya parçebûnê, lê belê ew çareseriyek ji bo pirsgirêka jiyana hevbeş di çarçoveyeke demokratîk de ye.



# Ji çiraxên wêjeya Kurdî

**Can Yûsiv**



Helbestvan Melevan Resûl; Ji awazê ber bi gotinê û ji helbestê ber bi kepezê ve.

Melevan yek ji helbestvanên Kurde, ku piraniya temenê xwe da ji bo parastina ziman û çanda Kurdî,bi bawer bû ku peyva durist di rûyê hewildanên çewisandin û helandinê de dîwarek bi hêze.

Melevan Rasûl, kurê Bajarê Dêrika zindîker û dewlemend bi mîrateya xwe ya çandî û hunerî , û pirrengiya xwe ya etnîkî û olî ye ku gelek sembolên wêjeyî û hunerî yên navdar daye, û çavên wî li cîhanek zimanî ya dewlemend hatin vekirin, tijî ji stranên gelêrî, çîrokên devikî û danişteyên ku zindî ji helbest, çîrok û efsûnan.

Helbestvan, hunermend û ragihandêr Melevan di sala 1960’an de li gundê Hemze Begê yê gundewarê Dêrikê ji dê û bavek Kurd (Elî û Meryem) hatiye dinya yê, ji gundekî ku dikeve dibin siya çiyayê Qereçoxê berzane , di himbêza malbatek neteweyî ya Kurd de mezin bûye, ku hatibû firşikkirin bi ruhê welatparêziyê û bi bawer bû ku nasname ne dirûşmek e, lê kiryarek rojane ya girêdayî bi rûmetdarî, ziman û dîrokê ve ye.

Di vê rewşê de, û li ser vê axê ku bibû û hîn jî dibe dergûşek ji bo helbestvan û hunermendên Kurd mîna (Mihemed Teyîb Tahir - Silo kuro - Yûsif Misêlîx û Mela Xelîl), ew bû minareyek ji bo afirîneriyê , huner, nasname û çanda Kurdî, Melevan rêya xwe vekir û bû dengek wêjeyî, hunerî û medyayî yê navdar, wî mêhite ji xaka wê ziman û ji asîmanê wê bire îlham û ji xelkên wê girte xewn û hêvî .

Wî qonaxa seretayî li dibistanên gundên (Siwêdîyê ,Besta Sûs û Hemze beg) xwendiye û qonaxa navîn û amadehî li bajarê Dêrikê û piştre jî li bajarê Hesekê peymabgeha amadekirina mamosteyan xwend û dûre jî kulîjeya perwerdehiyê xwende û di sala 2008,an de bi dawî kir ,ew di 1993’an de zewicî û bavê sê kura ye.

Melevan dest bi kariyera xwe ya hunerî kir di salên heştiyan yên sedsala borî de , wî destpêkê dest bi gera xwe bi muzîkê re kir, ew jêhatîbû di lêdana gelek amûrên mûzik ê de, mîna (Org , Tambûr , Keman, Baxlame û Ûdê ..). Dûv re wî xwe ji nivîsandina helbestê re terxan kir , ku di nav de hemû cureyên helbesta kilasîkî ya terazû , Helbesta nûjen ya azad, pexşan ta bighê helbesta Hayko wî nivîsandin, herwiha li gel afirîneriya wî di gotarên wêjeyî , çandî, çîrok û nivîsên şanoyê de, wî hemû di salên înkar û tengahiyê de bi zimanê dayika xwe nivîsandine, ji ber vê yekê wî helbest kire mîna fenerekî di tariya şevê reş de û her malikeka helbestê kire peyamek berxwedanê ,wî tîpên peyvên xwe bi tayên tîrojên rojê yên zêrîn dihûnandin ku xwendevanan dersên hestên kûr jê digirîn.

Di her toneke ku wî li sazê dixist, peyama wî bi hesret, êş û pêdarî bû di rûyê zordarî û tundiyê de , herwiha dengê nalîna têlên kemana wî ya xemgîn birînên birîndaran derman dikirin û jiyan dida giyanan û germiya hêviyê û ronahiya miradê dida dilên şikestî, û mûzik dikir zimanek duyemîn ji bo wijdana her birîndarên Kurd.

Di dema kariyera xwe ya hunerî û wêjeyî de, beşdarî birêvebirina hejmarek komên hunerî û Federasyonên çandî bûye,mîna (Koma Cûdî, koma Wanê, Tevna Çand û Huner, Yekîtiya Rewşenbîrên Cizîrê û Yekîtiya Nivîskarên Kurd li Sûriya...) û herwiha beşdarî hin saziyên din bû.

Ji ber vê yekê, Melevan , bi rêya helbest, gotar û bernameyên xwe yên medyayê, girîngiya peyva Kurdî lê vegerande ,bi wateya kiryareke mayînê ye ne tenê amûreke derbirînê ye.

Helbestvan û nivîskarê Kurd Melevan ku gelek helbestên klasîk yên terazû bi kêşe û rêzbend nivîsandine û li gel helbestên nûjen herwiha nivîsên şano , skêş û gotarên wêjeyî û çandî û simîner û velêkolînên ramyarî jî bi zimanê Erebî nivîsandine , ji berhemên wî yê wêjeyî yên herî berbiçav:

1- Şeş dîwanên helbestî di navbera (klasîk û nûjen) de bi zimanê Kurdî .

2- Nivîsarên 65 şano û skêçan nivîsandiye ew li ber çapê ne .

3- Pirtûkek lêkolînê li ser pêlawazên helbesta Kurd ya kevneşop, hem bi Kurdî û bi Erebî .

4- Pirtûkek bi navê “Fî zehmet Gilwan welbelût “ , bi Erebî

5- Nêzîkî 300 gotarên ramyarî û wêjeyî bi Kurdî û Erebî, piraniya wan di rojname û kovaran de hatine weşandin.

6- Belavkirina bi qasî 285 xelekên rojnamegeriyê, ji hevpeyivîn û dîdarvanî bi nivîskar û ronakbîrên Kurd re.

7- Pirtûkek bi zimanê Erebî li ser jiyana Şehîd Polat Herekol nivîsandiye.

8-Gurzek ji simîner û velêkolînên wêjeyî û ramyarî bi Erebî.

9- Amadekirina sê celeban ji Vekolînên ramyarî bi zimanê Erebî.

10- Pirtûkek binavê “Hilweşîna mîrnişînên Kurdî” li ser dîroka hilweşîna siyasî ya mîrnişînên Kurd.

Ji berhemên wî yên wêjeyî yên çapkirî:

1-Sê dîwanên helbestan( Pêdar ,Arîn û Çirîsk) bi Kurdî.

2-Pirtûkek lêkolînê li ser” pêlawazên helbesta Kurd ya kevneşop” , bi Kurdî û bi Erebî .

3- Pirtûkek bi navê “Fî zehmet Gilwan welbelût “ , bi Erebî

4- Qevdek ji şano û skêçan “Kezî “ bi Kurdî.

5 - Pirtûkek bi zimanê Erebî li ser jiyana Şehîd Polat Herekol

Gelek ji helbest û gotarên wî di malperên elktironî de , herwiha di rojname û kovarên wêjeyî û rewşenbîrî yên Kurdî, û hatine weşandin wekî (Serxwebûn , Rojda , Rewşenbîr, Şermola , Sêwan ,Destar , Dicle , Sorgul , Ronahî û hin din..)

Melevan ew ne ji pirtûkan fêrî helbestan bûye lê ew ji tîna dengê dayîkê dema ku ew lava dike , ji dengê bav dema ku ew dixemilîne çîrokan di şevên tarî de û li ser milê xwe hildigire barên çiyan û di dilê xwe de germahiya deştan,wî da li ser rêça ne ku bi çîçekan raxistî lê wî helbest nivîsandin ser dîwarên jibîrkirî , xewn û xeyalan bi şaxên hesret û bêrîkirinê ve girêdide ,wî yekrêzî kir di navbera helbest û muzîk, û di navbera peyv û awazê de da ku bibe hilgirê ala çanda Kurdî di rûyê bahoz û rikeberiyan de .

Ew beşdarî gelek bernameyên televîzyon û radyoyê bûye, ji ber ku wî wekî pêşkêşvan û biwêjvan li Satelîta Ronahî û Radyoya Dicle kar dikir , û her weha pêşkêşkirina helkeftên neteweyî û pîrozbahiyên niştimanî , nemaze di cejnên Newrozan de dikir .

Di warê wêjeyî de, wî hejmarek helbestên stranbêjiyê yên Klasîk nivîsandiye û hunermendên Kurdî awaz ji wan re çêkirine û strandine û tevlî albûmên xwe kirine , mîna:

1- Çav pêket û min dî çû :(koma Cûdî )

2- Zindana tarî : (Elî Gavan)

3- Gula min:( Ferhan Gorî )

4- Ansê:( Nûhad Yusef)

5- Heta mirinê : Ferhan Gorî ).

Bi destpêkirina şoreşa azadiyê li Rojava , diviya bû ku peyv veguhêre helwest, û helbestvan bibe menberek ji lewra Melevan berê xwe da ragihandinê da ku bibe dengek bihîstî ji bo pirsgirêka gelê xwe û bibe balyozek ji bo doza netewa xwe li ser menberên rastiyê, û bibe şervanek bi pênûs û dengê xwe li dijî hewldanên helandin û piştguhkirinê.

Karê wî tenê bi zimanê Kurdî re sînordar nema , lê wî gelek gotar, simîner û vekolîn bi zimanê erebî jî nivîsandin hewl dida ku di navbera her du çandan de pira ava bike û hişmendiya çandî li cem nifşên nû xurt bike.

Bi vê hevsengkirina di navbera peyv û medyayê de, Melevan bûye nimûnek ji bo rewşenbîrê neteweyî yê ku tenê ji vegotinê razî nabe, lê di heman demê de beşdarî afirandina dîrok û pêşerojê dibe, ew di radyoyê û medya Kurdî de xebitî, û bernameyên çandî û hunerî pêşkêş kir û mêvandariya gelek helbestvan, ramangêr û hunermendan kir û yek peyam hildigirte: “peyva azad û mayîndeya bi nasnameyê”

Wî 34 sal derbas kir di xizmeta rêbaza hînkirinê û perwerdehiyê de ,di dilê xwe de peyama zanîn û ronakbûnê hildigire, û bawer bû ku avakirina mirov ew gava yekem e ber bi rizgarkirina welat ve, di encama peywira wî ji bo pirsgirêka gelê wî , û beşdariya wî ya çalak di têkoşînên şoreşa 19ê Tîrmehê de li Rojavayê Kurdistanê, ew bû armanc ji tundiya rêjîma çûyî re ku bi rengekî bêdadî biryara dûrxistin wî ji erkê wî di sala 2013ê dan û ew veguheztin dadgeha terorê , di hewildaneke ku dengê azadiya ku tu carî di giyanê wî de melûl nebûyî vemirînin.

Melevan ne tenê helbestvaneke ku helbesta ku hema dinivîse, lê ew ronahiyê ji tayên roja zêrîn vedûhûne , gotinên wî bi xîmava hesta zelalbûyî têne çêkirin, û ew di axa xwe ya neteweyî de diçîne da ku geş bibin tîpên mîna sirûdên dayîkên Kurdan di şevên çiyayî de, helbestên wî ne tenê peyvên ku têne xwendin, lê ew henase ne, tên hilmijîn, hestên ku têne hîskirin, sirûdên ku di mehrava Kurdistanê de têne gotin.

Ew helbestvaneke ku welatekî ji peyvê çêdike , û ji wêneya helbestî nexşeyek nasnameyê diafirîne, ji kêşe û pêlawazan, ritma dilê ku lêdide ji bo jiyana Kurdan xêzdike , her malikek ji helbesta wî dibe pirek ku bîrdanka gelêrî bi hîvîyên neteweyî ve girêdide , her helbestek ruhê çiyayan tê de ronî dide û rayên ziman ji kaniyên giyan av dide .

Melevan beşdarî piraniya bûyerên çandî yên herêmî, mîhrîcanên hunerî û şevbuhêrkên Helbestê li Rojavayê Kurdistanê bûye, wekî helbestvanek ku derd û kulên tevahî gel hildigre,û hunermendek ku guhdarî nebeza gund û miletê xwe dike, bandora wî gihişte li ser nifşê nû ji nivîskaran û muzîkjenên yên ku ji serpêhatiya wî fêrî hêza girêdayînê, hêsaniya vegotinê, û kûrahiya peyamê bûyîn.

Wî gelek xelat û bawenameyên pesndariyê wergirtin ji ber beşdariyên wî yên bi nirx di warê edebî û çandî de, bi taybetî jî:

1- Xelata Mîhrîcana Helbesta Kurd (2008)

2- Xelata Sebrî Osman

3- Xelata Dicle ya huner û stranbêjiyê

4- Xelata Balxan

5- Xelata saziya Zimanê Kurdî

6- Xelata saziya Dicle ya çandî, û her weha hin xelatên din ji dezgeh, saziyên herêmî, partî û kesayetiyên navdar wergirtine.

Melevan Rasûl , rola wî bi nivîsandinê tenê ne sînorkirî ye, lê dirêj dibe ku bîranîna netewe bi rêya zimanê çand û têkoşîna aram bi peyvan diparêze, ziman li cem wî ne navgîneke, lê welatek dine û amûrek yê berxwedanê ya nerme li dijî tunekirina çandî ye, ew derdê netew di helbestên xwe de hildigire û derbirîna êşên wê , hêviyên wê û xewnên wê di rizgarkirin û rûmetdariyê de destnîşan dike .

Melevan peyamek bû û hîn jî pireke di navbera mîras û nûjeniyê de , di navbera deng û helwestê de, di navbera helbest û ala de, wî da ser rêça kesên li pêşiya wî meşiyan di vê rê de ,ew rêyekî di afirîne ji bo kesên ku li pey wî bêne, ew helbestvanek nayê şikandin, û hunermendek ne bêdeng e, û Kurdeke jibîra nake ku ziman welatek din e, stran berxwedan e,û peyv çekeke di destê bê çekan de.



Remezan Olçen

## Şêwra xwendina bi komî

Heftiya bihurî min li ser girîngiya xwendina bi komî nivîsî bû. Ez dixwazim vê heftiyê jî vê mijarê bidomînin. Wêje, edebiyat her çiqas di dema afirandinê de çalakiyeke takekesî xuya be jî, di dema fêmkirin û watedarkirinê de çalakiyeke civakî ye. Heta di dema afrinadinê de jî her çend pênûs di destê nivîkar de be jî, azmûn û kultur û dîrok wê hilberînê bixwazî nexwazî civakî dike. Bi taybetî di pêvajoya pêşketina wêjeya kurmancî de, ku bi salan di bin zextên polîtîk û de maye, xwendina bi komî ne tenê çalakiyeke çandî, di heman demê de rêyeke sereke ya parastin û pêşxistina ziman e. Şêwra li ser roman, çîrok û helbestên kurmancî, zemînekî zengîn ji bo krîtîka wêjeyî û avakirina hişmendiyeke hevpar amade dike.

Dema komek xwendevan li dora romaneke kurmancî -wek mînak berhemên Mehmed Uzun, Bextiyar Elî, Rênas Jiyan, Yildiz Çakar yan jî nivîskarek din- dicivin, ew ne tenê çîrokekê dixwînin; ew li ser tarîx, nasname û psîkolojiya civaka xwe nîqaşê dikin. Di xwendina bi komî de, her xwendevan bi perspektîfa xwe ya taybet rengekî dide berhemê.

Krîtîka ku di van koman de tê kirin, dibe sedem ku xwendevan ji xwendina “hêsan” derbasî xwendina “kûr” bibe. Analîzkirina teknîkên vegotinê, karakterên di romanê de û peywendiya wan a bi rastiya kurdewarî re, asta têgihiştina wêjeyî bilind dike. Ev yek bixwe re “xwendevanê profesyonel” diafirîne, ku nivîskar jî neçar dimînin berhemên hîn bi kalîtetir binivîsin.

Helbesta kurmancî, ji Melayê Cezîrî heta îro, her tim xwedî rîtmeke civatî bûye. Lê belê di xwendina bi komî ya modern de, ev rîtm vediguhere analîza estetîk û zimên. Şirovekirina metaforên helbestekê di nav komê de, asoyên nû li ber xwendevan vedike. Di şêwira helbestê de, peyvên ku dibe ku di jiyana rojane de hatibin jibîrkirin, ji nû ve zindî dibin. Ev pêvajo dibe sedem ku dewlemendiya ferhenga kurmancî derbasî hişê kolektîf bibe.

Wêjeyeke ku krîtîka wê neyê kirin, mîna dareke bê av e. Xwendina bi komî, li cihê ku saziyên akademîk an jî kovarên krîtîkê kêm in, dibe “mektebeke krîtîkê”. Dema ku xwendevan bi hûrgulî li ser kêmasî an serkeftinên berhemekê dipeyvin: Ziman tê parastin. Pê re bikaranîna rast a rêziman û peyvên resen tê nîqaşkirin. Standardîzasyon pêş dikeve. Pê re Kurmanciya nivîskî di nav xwendevanan de rûdine. Têkiliya Nivîskar-Xwendevan xurt dibe. Pê re nivîskar fêm dikin ku berhemên wan tên şopandin û fêmkirin.

Xwendina bi komî, ji bo wêjeya kurmancî mîna “laboratuvareke zimên” e. Ev şêwr û nîqaş, wêjeyê ji nav rûpelên pirtûkan derdixin û dixin nav jiyana zindî. Ew dibe sedem ku pirtûk ne tenê wekî kaxezekê, wekî “pira di navbera nifşan de” bê dîtin. Ji bo ku wêjeya kurdî bigihîje asteke gerdûnî, pêdivî bi xwendevanên ku rexne dikin, dipirsîn û nîqaş dikin heye. Komên xwendinê, vê hewcedariyê bi awayekî herî demokratîk û herî çandî tînin cih. Her gotineke ku di van şêwiran de tê gotin, binyada wêjeya siberojê xurttir dike.

# Ji bo zêdekirina qadên kesk li bajarê Qamişlo dar têne çandin

Nivîsgeha Park û Darçandiniyê, bi armanca zêdekirina qadên kesk û baştirkirina bedewiya bajêr projeyên darçandiniyê li kolan û taxên bajarê Qamişlo, pêkanîn.

**Lîloz Hisên/Qamişlo**

Nivîsgeha Park û Darçandiniyê ya Şaredariya Gel a bajarê Qamişlo di demsala biharê de xebat û heweldanên xwe ji bo dabînkirina jîngehek saxlem û kêmkirina qirêjiyê, didomîne. Di heman demê de bi armanca zêdekirina qadên kesk û baştirkirina bedewiya bajêr, projeyên darçandiniyê li çend tax û kolanan pêk aniye.

Rêvebera Nivîsgeha Park û Darçandinê Wan Misewer di vî derbarî de ji rojnameya me re behsa projeya çandina daran a li bajarê Qamişlo pêkanîn e axivî.

Rêvebera Nivîsgeha Park û Darçandinê Wan Misewer di destpêkê de behsa kar û xebatên nivîsgehê kir û wiha da zanîn: “Karê û xebatên me rojan e ye, bi taybet di demsala buharê de. Dema ku buhar tê em dest bi çandina daran dikin. Ji destpêka hatina buharê heya niha hezar û 188 dar hatine çandin, ji xwe ev dar şaredariya Gel a bajarê Qamişlo ji me re peyda kir. Di heman demê de jî, hejmareke ji rêxistinan bi me re bûn alîkar û 250 dar pêşkêş kirin.”

Cihên ku dar lê hatine çandin ev in: 250 daran bi hevkariya rêxistinekê, 120 daran li Parka Şehîd Ednan, 90 dar li ser nîverêya rêya Hilêliyê, 240 darên mircan li ser nîverêya Pira Cûdî-Qenat Siwês, 77 dar li Qada Newrozê, 21 dar li taxa Enteriyê, 85 dar li ser nîverêya Pira Cûdî, 120 dar li ser nîverêya rêya Hîzama bakur, di gel 65 darên din li heman cihî, 75 darên mircan li ser rêya Amûdê.

**‘Armanc çandina hezar û 800 daran e’**

Li gorî rêvebera Nivîsegeha Par û Darîandinê Wan Misewer heya niha çandina daran berdewam e û wiha berdewam kir: “Armanca me ew e ku em karibin hezar û 800 daran biçînin. Ji bo nîverêyên li ser kolanên sereke ku tijî giha bûye, derengmayîna nerakirina wê ji ber rewşa avhewayê bû herwiha me nikarîbû wan derman bikin li gorî biryaran, ji ber vê yekê berî ku ew giha hişk bibe em ê bi temamî rakin.”



**Rewşa parkên bajarê Qamişlo**

Wan Misewer di axaftinên xwe de behsa parkên bajarê Qamişlo bi taybet ya Giştî kir û wiha diyar kir: “Ev e deh salin çeksazkirin ji bo parkên bajarê Qamişlo nehatiye kirin di heman demê de ji ber rewşa şer hatibû paşguhkirin. Me di pilanên xwe yên sala 2026’an de çeksazkirina parakan daniye. Li gorî pilana darayî ku dighêje me, em kar û xebatên xwe pê dikin, alavên pêwîst em dikrin û yên din em pê parkan çeksaz dikin. Berî niha me parkek li aliyên rojavayê bajêr ava kir, lêçûna wê gihaşt derdora 4 hezar û 400 dolarê Amerîkî herwiha di pilana me de ku parkeke din li rojhilatê bajêr ava bikin.”



Wan Misewer behsa Parka Giştî kir û wiha got: “Em dengê û gazinên miletê xwe dişopînin derbarê çeksazkirina parka giştî, pilan û neqşeya wê bi giştî hatiye guhertin û gav bi gav em wê dişopînin. Demekê hatibû destpêkirin lê hat rawestandin ji ber rewşa avhewayê. Cihê meşê yên nû bi kevirên enterlok hatin avakirin. Di heyama kêmî du mehan wê ji nû ve Parak Giştî bê vekirin. Her wê wek xwe binmîne û deriyê wê ji hemû şêniyan vekiriye.”

Rêvebera Nivîsgeha Park û Darçandinê Wan Misewer wiha gotina xwe qedand: “Parastina paqijiyê û parastina qadên kesk berpirsiyariyek hevpar e, bajarê me mala her kesî ye û parastina wê erkê hemû şêniyên wê ye. Bêyî alîkariya milet em nikarin tiştekî bikin lewma divê şaredarî û milet bihev re alîkar bin, ji ber ku her du hev du temam dikin ji bo ku em karibin welatekî xwedî jîngeheke paqij, bi ewle û dûrî qirêjiyê, ava bikin. Em bi hêvîn e ku tu kes agir li nêzîkî daran pênexe, li gorî pêwistiyê dar bên avdan, xetên avê ku li nîveryan hatin kişandin neyên xirabkirin, darên ku me li pêşiya firoşgehan çandiye werin avdan û çop li deverên giştî neyên avêtin.”

# ‘Barana zêde zirar gihand zeviyên çandiniyê’

**Ayşa Silêman/ Dêrik**

**Cotkarên bajarê Dêrikê diyar kirin ku barana zêde ku di rojên dawî de li herêmê bariyaye zerareke mezin gihandiyê ziviyên çandiniyê.**

Ji ber zîpik û barana zêde ku di dema dawiyê de li ser herêma Cizîrê bariyaye, gelek ziviyên çandiniyê zerarên mezin dîtine, bi atybet li bajarê Dêrikê û gundewarên wê ku rêjeya herî bilind a baranê lê bariyaye.

Di derbarî rewşa çandiniyê li barjarê Dêrikê cotkarê bi navê Ehmed Ibrahîm û xwediyê patozekê yê bi nave Eladîn Xelo ji Rojnameya me re axivîn.

**‘Zeviyan zerarên mezin dîtine’**

Ehmed Ibrahîm da zanîn barana zêde zirar gihand zeviyan û wiha got: “Herêma me bi çandiniyê navda re, ev çend sal bûn ku herêm di zuwhayê re derbas dibû, cotkaran gelek zirar didîtin, ji ber ku piraniya şêniyên herêmê debara jiyana wan li ser çandiniyê ye. Lê îsal dema baran barî gelek kêfa cotkaran hat, lê mixabin rêjeya baranê gelek zêde bû û careke din zirar gihişt zeviyan, ji ber ku baranê derfet nedida cotkaran derman belav bikin di nav zeviyên xwe de, cehdasî, xerdel û zeng di nav zeviyan de zêde derket û zevî ber bi tunebûnê ve çûn. Salên borî wek van deman me zeviyên xwe çinî bûn û me dest bi çandina pembû, nîst, nok û genimê havînî kiribû. Niha ji ber ku baran dibare em nikarin bi alavan derman jî li zeviyan bikin, ev yek dibe asteng ji bo me lewma em neçar dibin bi destê xwe lê bikin. Em bi hêvîne ku îsal buhayê genim bilind bibe û di milê zirara ku gihiştî cotkaran desteyên berpirsiyar bi me re bibin alîkar, ji ber ku herêm di hejariyê re derbas dibe.”



Ehmed Ibrahîm



Eladîn Xelo

**‘Herî zêde zirar gihiştiye zeviyên Dêrikê’**

Yek ji xwediyên patozan yê bi nave Eladîn Xelo anî ziman ku ew ji barjarê Qamişlo ye û niha li bajarê Dêrikê patozên xwe çaksaz dike û wiha got: “Îsal baran gelek barî û ev yek ji bo zeviyan nebaş bû, bêtirî xwe herêma Dêrikê zirar gihiştiyê, ji ber Qamişlo û Hesekê xwezaya wê zuwaye her avê dixwaze, lê herêma Dêrikê bixwe bi şilbûna xwe tê naskirin ku gelek çem û kanî têde hene. Lewma bilindbûna rêjeya baranê hişt ku zevî di nav avê de bimînin, dema zirar bighêje zeviyan dighêje xwediyê patozan jî. Herêma Dêrikê ya herî navdara bi çandiniyê dema zevî tu berhem jê dernekeve ev yek dibe asteng li pêşiya karê me jî. Em niha li barjarê Dêrikê ne da ku em patozên xwe çaksaz bikin û amadekariyên xwe ji bo çinîna zeviyan bikin, dpatozên me yên herî pêşketî ne di Rojava de.”





# ‘Mersûm mafê zimanê Kurdî garantî nake, divê destûr hebe’

Mamosteya Zimanê Kurdî li Zanîngeha Rojava Mizgîn Hesen diyar kir ku hikumeta demkî zimanê Kurdî wekî zimanê niştîmanî destnîşan kiriye, lê zimanê niştîmanî piştgiriyeke çandî hildigire, lê tu piştgiriyek yan berpirsyariyeke destûrî hilnagire û got, “Pêwîst e zimanê Kurdî mîna Erebî zimanê hikumet, bazar, diplomasî, perwerde ... yê welat be.”

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

**Girîngiya ziman ji bo mirovan**

Di jiyana gelan de ziman xwediyê girîngiyeke gelemperî ya seranseriya dîrokê ye. Di hundirê zimanê gelekî de mirov dikare bi lêkolînî hemû serpêhatiyên wî gelî yên di tevahiya dîroka xwe de jiya ye lêbikole û bibîne. Ziman xwe bi riya axaftinê û nivîsandinê derdixe der, lê cureyên xwebilêvkirina wê hene. Bi riya stran, çîrok, roman, helbest, şano, sînema, alavên ragihandinê, wêneyan û bi gelek cureyên din ziman dikare xwe bilêv bike ango derxîne der. Ji awayê derketina dera ziman re, bi awayekî giştî mirov dikare bêje nirxên çandî yên gelekî; ji ber ku ziman hişkeber bi çandê ve wekî goşt û neynûkê girêdayî ye. Her wiha çand jî bingehê xwe dispêre dîroka wî gelî. Bi vê sedemê dema mirov li ser zimanê gelekî lêkolîn bike, tê de dikare dîrok, çand, nirxên gelêrî, awayê jiyana wî gelî, ê, azar û kêfxweşî, şîn û şahiyên wî gelî bi hêsanî bibîne. Girîngiya bikaranîna ziman ji vir tê. Dema ku gelek nikaribe zimanê xwe bikar bîne, ji gihiştin û tamkirina van berheman tevan bêpar dimîne. Ji ber ku ew kesên zimanê xwe bikar neynin, bêguman pêwîstî bikaranîna zimanê gelekî din dibin. Di hundirê zimanê gelekî din de jî nikarin nirxên xwe bibînin û xwe xwediyê nirxê zimanê gelê din dibîne. Bi vî rengî jî çand, dîrok, jiyan û zimanê xwe ji bîr dike û winda dike. Gelê Kurd ji bi sedsalan rastî vê yekê hatin, lê wan têkoşîn kirin û bi devokî zimanê parastin, ta ku bighînin roja îro.

**Înkarkirina zimanê kurdî li Sûriyê**

Bi parçekirina Kurdistanê di nava 2 beşan, piştre 4 beşan de jî, Kurd hatin desteserkirin û rastî asmîlasyonê li ser her tiştî hatin, bi taybet ziman. Ji ber ku her tim dewletên desthilatdar rê li ber zimanê Kurdî digirtin û nedihiş Kurd bi zimanê xwe biaxivin. Bi taybetî li Rojavayê Kurdistanê rejîma Baasê di nava 60 saliya xwe de tu caran, ne Kurd û ne jî zimanê wan qebûl nedikir. Înkarkirina zimanê kurdî li Sûriyê, bi taybetî di bin desthilatdariya partiya Baasê de, wekî beşek ji polîtîkaya asîmîlasyonê ya berfireh dihat dîtin ku hebûna nasnameya Kurdî û zimanê wan tune dihesiband. Bi salan kurdên Sûriyê di perwerdehiya fermî, saziyên



dewletê û çapemeniyê de rastî astengiyan hatin û zimanê kurdî wekî zimanekî qedexekirî di jiyana giştî de dihat binavkirin. Herwiha ji ber ku zimanê kurdî li dibistanan nedihat xwendin û di saziyên dewletê de nedihat bikaranîn, ev jî hişt ku nifşên wê demê ji zimanê xwe dûr bikevin. Rejîma Baasê di bin dirûşmeya yek netewe û yek ziman de, hewl da ku pirrengiya çandî û zimanî ya kurdan tune bike. Lewra bi destpêkirina krîza Sûriyê re, li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê (Rojava), perwerdehiya bi zimanê Kurdî dest pê kir û zimanê Kurdî bû zimanê fermî, ev yek jî wekî pêngavek ji bo şikandina wê înkarkirinê bû. Lê piştî 8’ê Kanûna 2024’an rewş li Sûriyê hat guhertin û hikumeteke nû hat avakirin. Tevî vê pêşketinê, siberoja zimanê Kurdî hîn jî mijareke stratejîk e di danûstandinên siyasî de, bi taybet di çarçoveya Peymana 29’ê Çileyê de.

**Hikumeta demkî hilandinê dixwaze**

Xalên Peymana 29’ê Çileyê ya di navbera Hêzên Sûriya Demokratîk û hikumeta demkî ya Sûriyê de, bi garantiyên navneteweyî, pêk hat. Li gorî vê peymanê jî wê xebat li ser bingeha entegrasyona demokratîk bên kirin, lê hikumeta demkî ya Sûriyê dixwaze her tiştî bi awayê hilandinê bigre dest û hemû destkeftiyên “Şoreşê Rojava” têk bibe û ji holê rake. Bi taybet mijara zimanê Kurdî ku hikumeta demkî ya Sûriyê wê napijrîne weke zimanekî ferîmî ne yê perwedeyê û ne jî yê welat. Lê her kes jî ji pisporiya bilind a derçûnên Zanîngeha Rojava û zanîngehên din ên ku ji hêla Rêveberiya Xweser ve di 16 salên şer de hatine damezrandin zanin ku ev zanîngeh bûn wekî alternatîfek ji zanîngehên hikumeta têkçûyî re. Ji ber ku rejîma Baasê deriyê zanîngehê xwe ji xwendekarên li herêmê re girtin. Lewra zanîngehên Rêveberiya Xweser ji bo van xwedekaran bû piştgirî û garantiyek ji bo pêşeroja wan. Di heman demê de zanîngehên Rêveberiya Xweser bi sazî, zanîngeh û akadmiyên biyanî re peyman û hevakî çêkirin




û danîne, da ku ev yek pisporiyê biguherînin û ji bo bernameyên xwe nasnameyek qismî bi dest bixin. Ji ber ku zanîngehên li Rojava fakulteyên cihêreng ên wekî bijîşkiya mirovan, endezyarî ya (petrol, mîmarî û çandinî), hiqûq, ziman û zanistên perwerdehiyê vedihewîne. Di heman demê de bi salan li dibistanên Rêveberiya Xweser nasnameya zimanê hemû pêkhateyan tê parastin ku hemû zarok bi zimanê fêr dibin. Niha jî hikumeta demkî ji bo zimanê Kurdî mersûmek derxistiye, lê ew mersûm tu garantiyê ji bo parastina mafê ziman nade, hem jî ew bi xwe zimanê Kurdî qebûl nake. Derbarê neqebûlkirina hikumeta demkî ya Sûriyê ji zimanê Kurdî re weke zimanekî fermî, mamosteya Zimanê Kurdî li Zanîngeha Rojava Mizgîn Hesen ji Rojnameya me re axivî.

**‘Perwedeya bi zimanê dayikê mafê rewa yê mirov e’**

Mizgîn Hesen di destpêka axaftina xwe de da diyarkirin ku perwerdeya bi zimanê dayikê mafekî mirov ê xwezayî ye û wiha got: “Ziman sîstemeke pêwendîyê di navbera du alîyan de ye, sîstemeke pevguherîna hest û hiziran di navbera mirovan de ye. Di heman demê de ew wesîleya derbirîna pêdivî, nêrîn û rastiyan di navbera mirovan de ye. Her wiha ew sîstemeke arezûmendane ye, ji bo sembolên deng ku ji bo pevguherîna hest û hiziran di navbera endamên komekê ziman a hevgirtî de, bi kar tê. Ji dema ku zarok ji dayik dibe heta ku digihêje temenê dibistanê; temenê ku hînî ziman bibe, di pêvajoya wergirtina ziman re derbas dibe. Zarokê çi ziman wergirt, dema ku di dibistanê de heman zimanî hîn nebe ji nû ve fêrî peyvine nû û hevtevnine nû dibe, ev yek dibe bargiranî û dike ku zarok ji xwendinê bireve lewre perwerdeya bi zimanê dayikê mafekî mirov ê xwezayî ye ji ber ku ziman pêkhateyeke navendî ya xwezaya mirov û çanda wî ye, mafên ziman jî ew rêzeberpirsyarî ne ku dikevin ser milên dewletan. Mafê mirov ê ku bi ziman ve girêdayî ye, hejmarek ji daxwazên destûrî ne ku ev daxwaz di hevpeymanên navdewletî yên mafên mirovan de hatine sepandin. Mafê ziman di qanûna navdewletî ya mafê mirovan de hatiye amajekirin. Mînak: qedexekirina newekheviyê, mafê derbirîna azad, mafê jiyana taybet û mafê hînbûna bi zimanê dayikê.”

**‘Hikuemta demkî hewl dide dewleteke yekzimanî ava bike’**

Mizgîn Hesen eşkere kir ku hikumeta demkî ya Sûriyê ne tenê zimanê Kurdî napijrîne, lê hewl dide nimûneya pirzimaniyê ya Rêveberiya Xweser têk bibe, ji bo ku dewleteke yekzimanî ava bike û wiha domand: “Ji ber ku erdnîgariya Rêveberiya Xweser berfireh bû, ew jî ji ber berxwedana li hember DAIŞ’ê, êdî pêwîstî çêbû ku di Hevpeymana Rêveberiya Xweser de amaje bi pirzimaniyê; zimanê gelên herêmê bibe û zimanên Erebî, Kurdî û Suryanî bibin zimanên fermî yên herêmê. Lê niha jî hikumeta Demkî ya Sûriyê hewl dide vê nimûneya pirzimaniyê têk bibe, da ku dîsa dewleteke yekzimanî ava bike. Ev hewldanên han, hewldanên pûç in û bingeha wan ji hişmendiya netewperestî û navendîbûnê tê.”

**‘Divê zimanê Kurdî mîna Erebî zimanê hikumet, bazar, diplomasî, perwerde ... yê welat be’**

Mizgîn Hesen anî ziman ku hikumeta demkî zimanê Kurdî wekî zimanê niştîmanî destnîşan kiriye, lê zimanê niştîmanî piştgiriyeke çandî hildigire, lê tu piştgiriyekê yan berpirsyariyeke destûrî hilnagire û wiha pê de çû: “Serokê hikumeta demkî Ehmed El-Şeri di madeya sêyem a mersûma 13’em de, amaje bi zimanê Kurdî kir ku Kurdî zimanekî niştîmanî ye. Ev made ji aliyekî ve erênî ye, lê bi tu awayî têrê nake. Ji ber ku zimanê niştîmanî piştgiriyeke çandî hildigire, lê tu piştgiriyekê yan berpirsyariyeke destûrî hilnagire. Ji ber wê ev made gaveke erênî ye, lê belê neyînî ye jî. Ji ber ku rê li ber Kurdî digire ku bibe zimanekî fermî û hevseng be, bi zimanê Erebî re. Ji bo wê pêwîst e zimanê Kurdî mîna Erebî zimanê hikumet, bazar, diplomasî, perwerde ... yê welat be.”

**‘Em rê nadin ku zimanê me qels bibe’**

Mizgîn Hesen axaftina xwe wiha qedand: “Em wek xebatkarên ziman Kurdî bi salan e karê xwe dikin, perwerdeya bi zimanê Kurdî berdewam dikin û bi tu awayî rê nadin ku zimanê me qels bibe û nebe zimanê perwerdeyê, lê heta ku zimanê Kurdî bibe zimanê fermî yê Sûriyê û bibe zimanê dewletê. Pêwîstî bi têkoşîneke pir mezin heye. Çiqasî asta têkoşînê bilind be, ewqasî armanc pêk tên.”

# Konferansê salek derbas kir, îro erka partiyên Kurdî çi ye?

Konferansa Yekrêzî û Yekhelwestiya Kurdî ya Rojavayê Kurdistanê salek derbas kir, ji encama konferansê belgenameyek hat nivîsandin û şandeyek hat avakirin. Tevî gelek hewldanên domandina kar û xebatê jî, lê hîna negihiştiye armancên xwe, di nava geşedanên heyî de ji bo vejandina ruhê konferansê û bidestxistina mafên gelê Kurd, erka partiyên Kurdî çi ye?

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

### Lidarxistin Konferansê û beşdarvanên Kurdistanî

Konferansa Yekrêzî û Yekhelwestiya Kurdî ya Rojavayê Kurdistanê li bajarê Qamişlo di 26'ê Nîsana 2025'an de bi beşdariya nêzîkî 50 partiyên siyasî yên Kurdî ji Rojavayê Kurdistanê hat lidarxisin. Bi amadebûna 400 delegeyî konferans bi rê ve çû. Ji Bakurê Kurdistanê Hevserokê Partiya Herêmên Demokratîk (DBP) û Parlamenterê Êlihê Keskîn Bayindir, Parlamenterên Amedê yên Partiya Wekhevî û Demokrasiyê ya Gelan (DEM Partî) Serhat Eren û Mehmet Kamaç, Parlamentera Mêrdînê Salîha Aydenîz û Parlamentera Wanê Gulcan Kaçmaz Sayigit beşdarî konferansê bûn. Herweha ji Başûrê Kurdistanê Nûnerê serok Mesûd Berzanî Dr. Hemîd Derbendî, berdevkê Koalîsyona Navneteweyî Scott Boles, berdevkên Yekitiya Niştimanî ya Kurdistanê (YNK) jî li konferansê amade bûn. Konferansa Kurdî ji girîngtirîn gavên dîrokî bû ku hat lidarxisin, ne tenê hêviya gelê Kurd li Rojava ji bo bidestxistina mafê Kurd ji hemû aliyê ve pêkan bû, lê belê hêviya yekrêziya gelê Kurd hem jî partiyên siyasî li ser asta Rojava û tevahiya Kurdistanê xurtir bû. Hêjayî bibîrxistinê ye ku hêviyeke mezin li cem gelê Kurd ava bû ku piştî Konferansa Kurdî li dar ket, ew ê kongreya netewî ya yekbûna Kurdan bê lidarxistin.




### Derencama konferansê

Daxuyaniya dawiyê ya konferansê bi beşdariya nêzîkî 50 partiyên siyasî yên Kurdî ji Rojavayê Kurdistanê, encamên konferansê di konferanseke rojnamevanî de hatin ragihandin: Konferansa Yekrêzî û Yekhelwesta Kurdî li Rojavayê Kurdistanê di 26'ê Nîsanê 2025'an de li bajarê Qamişlo piştî diyalogên demdirêj û hewldanên spasdar ji heval û birayan ve, bi beşdariya partiyên Kurdî, rêxistinên civaka sivîl, tevgera jinan, rêxistinên jinan û çalakvanên civaka Kurd ên serbixwe ji herêmên cuda yên Kurdî li Sûriyê, bi armanca pejirandina dîtineke yekgirtî ya Kurdî li ser avakirina Sûriyeke nû û beşdarbûna di teşedana paşeroja wê û çareserkirina pirsgirêka Kurdî de, di vê qonaxa girîng a dîroka Sûriyê de, piştî hilweşîna rejîma zordar li Şamê di 8'ê Kanûna Pêşîn a 2024'an de, ev rejîma ku azadî û rûmeta gelê Sûriyê bi hemû pêkhateyên wê yên neteweyî, olî û civakî binpê kir, û welat li seranserê erdnîgariya Sûriyê wêran kir, û bi mîlyonan ji gelê wê kuştin, koçber û penaber kirin, û her çend gelê Sûriyê ji bo hilweşandina wê rêjîmê û bidawîkirina zordariya wê, û bidestxistina azadî û rûmeta xwe qurbanî pêşkêş kirin, gelê Kurd li Sûriyê jî di rûbirûbûna wê rejîmê de gelek qurbaniyên mezin û bi hezaran şehîdan dan. Gelê Kurd bi dehan salan têkoşîn kir, da ku zordariya neteweyî ji ser xwe rake û mafên xwe yên neteweyî bi dest bixe, her dem têkoşîna xwe ya neteweyî bi têkoşîna xwe ya niştimanî ve girê da ji bo avakirina sîstemek demokratîk a piralî li Sûriyê. Li ser bingeha berpirsiyariya dîrokî û bersivdayîna ji pêdiviyên qonaxa niha, avakirina dîtineke siyasî ya hevbeş a Kurdî ku îradeyeke kolektîf û projeyek rastîn ji bo çareseriyeke dadmend ji bo pirsgirêka Kurdî li Sûriyê wekî dewleteke demokratîk û nenavendî nîşan bide. Beşdarên konferansê "dîtina hevbeş a Kurd" wekî belgeyeke bingehîn pejirandin. Ev dîtin îradeya kolektîf a Kurdan nîşan dide û rêyek rastîn ji bo çareseriyeke dadperwer û berfireh a pirsgirêka Kurd di çarçoveya Sûriyeke yekgirtî de pêşniyar Divê ev Sûriyeya yekgirtî xwedî nasnameyeke pir-etnîkî, pirolî, pir-çandî û pir-neteweyî Destûra Sûriyê divê mafên neteweyî yên gelê Kurd garantî bike, pabendî peymanên navneteweyî yên mafên mirovan be, û azadî û mafên jinan biparêze û beşdariya wan a bi bandor di hemû saziyan de (siyasî, civakî, leşkerî) misoger bike.: Konferans daxwaz dike ku ev dîtina hevbeş bibe bingehek ji bo diyaloga neteweyî, di navbera hêzên siyasî yên Kurd bi xwe de. Konferans daxwaz dike ku ev dîtina hevbeş bibe bingehek di navbera wan û rêveberiya nû ya Şamê û hemû hêzên din ên neteweyî yên Sûriyê de.: Ev diyalog divê bibe alîkar ji bo avakirina Sûriyeke nû ku hemû gelê xwe hembêz bike, ti pêkhateyekê paşguh neke yan ji holê rake, dûrî zihniyeta yekalî be, rûmet û mafên welatiyan bi destûrî bê cudahî biparêze, û bibe faktorek aramî û ewlehiyê li herêmê bi rêzgirtina li têkiliyên xwe yên navneteweyî. Konferansê biryar da ku di demek nêzîk de şandeyeke hevbeş a Kurdî were avakirin. Erka vê şandeyê ew e ku ji bo pêkanîna vê dîtinê di warê siyasî de bixebite û bi aliyên peywendîdar re danûstandin û diyalogê bike da ku naveroka wê misoger bike. Armanc ji vê konferansê ragihandina yekhelwestiya Kurd û avakirina şandeyeke hevpar a Kurdî ye, ji bo danûstandina li gel hikûmeta nû ya Sûriyê û misogerkirina mafên gelê Kurd.

### Şandeya Kurdî

Avakirina Şandeya Kurdî armanc jê bû ku kesayet û nûnerên partiyên siyasî bi hev re kom bibin û bi yekdengî li ser bingeha belgenameya Konferansa Kurdî biçin Şamê û doza mafê gelê Kurd li Rojavayê Kurdistanê bikin. Navên endamên Şandeya Kurdî ya ku dê bi Hikumeta Sûriyê re li ser mafên Kurdan dan û standinan bike di 5'ê Hizêrana 2025'an de hatin eşkerekirin. Fermandarê Giştî yê Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) Mezlûm Ebdî li ser hesabê xwe yê Xê derbarê Şandeya Kurdî daxuyaniyek belav kir. Mezlûm Ebdî di daxuyaniya xwe de anî ziman: "Avakirina Şandeya Kurdî di çarçoveya bicîhanîna peymana 10'ê Adarê de ye ku tekezî li ser parastina mafên gelê Kurd bi destûrî li Sûriyeke yekgirtî kiriye. Em bawer dikin ku naskirina mafên pêkhateyan bingeha avakirina Sûriyeke Demokratîk û dadmend e ku hemû alî tê de beşdar bin. Her du şande, Şandeya Bakur û Rojhilatê Sûriyê û Şandeya Kurdî hev temam dikin, pêbendbûna me bi diyaloga niştimanî wekî vebijarkeke stratejîk ber bi paşerojeke dadperwerane û wekhevî nîşan dide." Hevserokatiya Şandeya Kurdî daxuyaniyeke nivîskî belav kir. Endamên Şandeya Kurdî ya ku piştî "Konferansa Yekrêzî û Yekhelwesta Kurdî ya Rojavayê Kurdistanê" hat avakirin bi daxuyaniyeke nivîskî hat eşkerekirin. Navên endamên Şandeya Kurdî ya "hevdîtinên bi Hikumeta Sûriyê, aliyên navneteweyî û Kurdistanî re" hatin eşkerekirin. Hat diyarkirin ku Şandeya Kurdî dê di çend rojên pêş de dest bi hevdîtinên xwe bike. Li gorî daxuyaniyê, Şandeyê civîna xwe ya damezirandinê 4ê Hezîranê bi beşdariya Fermandarê Giştî yê Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) Mezlûm Ebdî û Fermandara Yekîneyên Parastina Jinê (YPJ) Rohilat Efrînê û endama Dîwana Konferansa Yekrêzî û Yekhelwesta Kurdî ya Rojavayê Kurdistanê Îlham Ehmedê li dar xist. Hevserokatiya Şandeya Kurdî di daxuyaniya xwe de ragihand: "Piştî şêwirên di navbera aliyên beşdarî Konferansa Yekrêzî û Yekhelwesta Kurdî de bûne ku 26ê Nîsana îsal hat lidarxistin û li gorî biryara konferansê ya pêwîstiya avakirina şandeyeke hevbeş a Kurdî ji bo diyalogê bi hikûmeta Şamê, aliyên navneteweyî û Kurdistanî re li gorî nêrîna hevbeş a Kurdî ya derbarê Sûriyê û doza Kurdî de, şandeyê civîna xwe ya damezirîner 4ê Hezîranê li dar xist. Di civînê de Fermandariya Giştî ya Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) Mezlûm Ebdî û Rohilat Efrîn, endama Dîwana Konferansê Îlham Ehmed amade bûn û Şande dê di çend rojên bê de yekser dest bi erkên xwe bike." Hevserokatiya Şandeya Kurdî navên endaman eşkere kir: "Perwîn Yûsif û Mihemed Îsmaîl wekî hevserokên şandeyê hatin destnîşankirin. Aldar Xelîl, Rîhan Loqo, Ehmed Silêman, Silêman Oso, Selah Derwêş, Nesredîn Îbrahîm û Feysel Yûsif jî wekî endamên şandeyê hatin diyarkirin." Ji wê demê heya roja îro hîna şande serdana Şamê nekir, sedem jî riyên diyalogê di navbera şandeyê û hikumeta demkî de nehatin vekirin, herwiha hikumet ket bin bandora siyaseta dewleta Tirk a ku nedixwest bi tu rengan ev hevdîtin çêbibin.

### Konferansê salek li pişt xwe hişt, divê partiyên Kurdî çi bikin?

Konferansa ku beriya salekê hat lidarxistin di dîroka gelê Kurd de destkeftiyeke pir mezin bû, ji ber ku yekem car partiyên siyasî yên Rojavayê Kurdistanê bi piştgirya partiyên Kurdistanî, li hev kom dibin, li ser nêrîneke, armanceke û helwesteke doza Kurdî nîqaş dikin û li hev dikin. Piştî van geşedan û êrişên ku Rojava tê re derbas bû, herwiha entegirasyona ku tê meşandin, divê laşekî siyasî û lêvegereke Kurdî ya siyasî çêbibe. Lêveger û laşê siyasî ji hemû partiyan bi tevkariya hemû rêxistên civaka sivîl, saziyên rewşenbîrî û kesayetên xwedî bandor çêbibe. Divê ruhê konferansê were vejandin, bibe çekeke siyasî û parastina mafê Kurdan bike. Di demeke wiha de ku guhertinên mezin di Rojhilata Navîn de rûdidin, çeka Kurdan ne çekên leşkerî ne, yekrêzî, siyaset û xebata diplomatîk e. Lewma hevgirtina partiyên Kurdî li Rojava ji bo gelê Kurd li Rojavayê Kurdistanê dibe çekekî bêhempa. Bi boneya derbasbûna vê konferansê divê hemû partiyên ku li ser belgenameya Konferansa Yekrêzî û Yekhelwestiya Kurdî îmze kiribûn bi yekhelwestê daxuyaniyekê bi hev re bidin, tê de tekez bikin ku partiyên Kurdî hîna xwedî helwesteke tekane ne, berjewendiya wan gelê Kurd e û bibêjin em ê laşekî siyasî ji bo parastina mafê Kurdan û hebûna gelê Kurd ava bikin.



# Di serdema teknolojiyê de; hilweşîna pîvanên jiyanê

Teknolojiya amûreke girîng e û dikare sûd jê were girtin, lê ger bi awayekî ne rast bê bikaranîn ziyanên mezin bi xwe re tîne. Niha jî bûye sedema hilweşîna pîvanên jiyanê. Gelo sedema vê yekê teknolijiya ye an mirov bi xwe ye?

**Aryen Hesen**

Di serdemekê de ku ekran bûne beşek ji jiyana rojane, teknoloji êdî ne tenê amûreke bikaranînê ye, lê belê veguheriye hêmanek bingehîn ku têkiliyên mirovan di nav malbat û civakan de ji nû ve şekil dide. Ciwan û zarok ji wateya xwe ya xwezayî derketine, li şûna ku ew înternet û teknolijî birêvebibin mixavin teknolojî û înternet wan birêvedibe. Gelo teknoloji di xurtkirina têkiliyên malbatî de bi ser ketiye, an jî bi bêdengî beşdarî hilweşîna wan bûye?

### Derketina Înternetê û pêşketina teknolojiyê

Weke ku tê zanîn înternet di salên 60'î de derketiye, avabûna înternetê ji bo kesên ji hev dor ango bi kesên ji derveyî welat re têkiliyê bikin. Em dikarin bêjin ku înternet di destpêkê de weke amûrê bikaranînê ji bo hêsankirina lêkolîn û têkiliyê bû. Avabûna înternetê û pêşketina teknolojiyê erênî û neyniya wê jî heye, gelo pirsgirêk ji teknolijiyê ye ango ji kesê bi awayekî neynî bikartînê ye? Mirov dikare bi gelek awayan sûdê ji teknolojî û înternetê bigire. Lê di dema me ya niha de pêşketina teknolojiyê bi awayên neynî tên bikarnîn, em dibînin ku teknolojî û înternet mirovan bi rê ve dibe ne ew, bi rengekî re normal mirov ketine bin bandora teknolojiyê, li şûna ku teknolojî bibe amûra alîkariyê bûye amûra lîstina bi mêjiyê mirivan.

### Bandora Înternetê li ser Civak



Înternet di çend salên borî de bûye toreke cîhanî û herkes bi awayekî ne nomal bikartîne. Şîrketên telekomunîkasyonê li welatên cuda yên cîhanê ji ber girîngiya wê ya mezin di pêşxistina teknolojiyên teknolojîk ên nûjen, baştirkirina mezinbûna aborî, bilindkirina asta jiyanê û hêsankirina jiyana mirovan de, ji bo pêşxistina vê torê xebitîne. Vê toreyê ji salên nodî yên sedsala borî vir ve di cîhana ragihandin û komputeran de şoreşek mezin pêk aniye. Înternetê gelek tiştên ku berê xeyal nedikirin dane mirovan, û bi saya wê, mirov karîne qadên cûrbecûr ên jiyana pîşesazî, bazirganî, aborî û siyasî pêş bixin.

Tevî bandora erênî ya girîng a derketina holê ya înternetê, aliyê neyînî jî di gelek civakên Rojavayî û Erebî de pir berbiçav bûye. Înternetê bandor li rewşa psîkolojîk a mirovan kiriye û ev bandor li hemû aliyên jiyanê kiriye. Înternet bûye sedema zêdebûna materyal, wêne û vîdyoyên pornografîk ên bi ziyan ku bandor li jiyana zarok, ciwanan û hemî beşên civakê kiriye. Ev yek daketina pîvanên exlaq û hilweşîna di civakan de roleke mezin dilîze. Belavbûna gotegotên xeternak ku dikarin bandorê li jiyana kesan bikin û ji wan re bibin sedema pirsgirêkên psîkolojîk, civakî û malbetî.

Teşwîqkirina sûc û bêexlaqiyê bi rêya fîlm, rêzefîlmên televîzyonê, stranên bê wate pêş dixin. Di heman demê de belavbûna nexweşiyên ku ji ber bêçalakî û bêhalîbûna ji ber rûniştina dirêj li ber komputeran û karanîna zêde



ya telefonê çêdibin, ku dibe sedema pirsgirêkên dîtinê û gelek pirsgirêkên din ên tenduristiyê. Kêmkirina têkiliya jiyanê di nava civakê de û qelsbûna girêdanên civakî di nav malbatan de. Tecrîd, tenêtî û vekişîn ji nava civakê bandoreke mezin li ser laş û fikirê mirovan dike.

### Bi înternetê re têkiliyên malbetê kêmbûn

Malbet bi kombûna ku dora hev jiyana komînal tên naskirin, lê bi pêşketina teknolojiyê re têkiliyê malbetê gelek lawaz bûye û her endamek malbatê li cihekî û bi fikirekî jiyan dike. Zêdebûna hilweşîna malbatê, ji ber ku înternet bûye çavkaniya sereke ya agahdariyê li şûna têkiliya bi endamên malbatê re. Nerêzdariya di navbera endamên malbetê de pêşketiye. Guhertina tevgerên kesan di têkiliyên wan de bi hev re. Lêkolînek vê dawiyê (2024) nîşan da ku karanîna medyaya civakî bandorek girîng li ser têkiliyên malbatî dike, nemaze bi kêmkirina kalîteya ragihandina rasterast di navbera endamên malbatê de. Lêkolînek zeviyê li ser ciwanan eşkere kir ku dema ku ew li ser înternetê derbas dikin dibe sedema kêmbûna ragihandina rû bi rû di nav malbatê de. Lêkolînek zanîngehê têkiliyek berevajî di navbera tiryakbûna înternetê û hêza têkiliyên malbatî de nîşan da; her ku karanîna zêde zêde be, girêdanên malbatê qelstir dibin. Pispor destnîşan dikin ku karanîna zêde ya teknolojiyê dikare bibe sedema pirsgirêkên cidî û xeter.

### Bandora teknolojiyê li ser ciwanan

Ciwan bi dênemîka civakê tên naskirin ku ji bo pêşeroja civakê xwedî rolin, lê ev ciwan bi pêşketina înretnet û teknolojiyê re ji civakbûnê dorketine û hertim dixwazin bi tenê bimînin. Bandora tênolijiyê li ser fikir, denduristî û tevgera wan jî dike. Gelek caran tişta ku li ser înternetê li pêşiya van ciwanan derdikevin teşwîq dikin ku bikarbînin mînak standina madeyên xişbir ku di dema dawiyê de nava ciwana de gelek derketiye pêş. Ciwan ku di temena sîpertiyê de ne ku dixwazin xwe îfade bikin, lê bikaranîna şaş ya teknolojiyê de jiyana wan diguherîne. Em çiqas bêjin niha serdema teknolojiyê ye, eger ciwan nikaribin xwe biparêzin wê di gelek şaştiyan re derbas bikin ku niha weke azadiya kesayetî dibînin wê de pêşeroja xwe de poşman bibin.malbatî û carinan jî tevgerên êrîşkar di navbera zarok û dayîk û bav de.

### Zarok teknolojî û înternetê ji mêjiyê xwe bêtir bikartîne

Bi pêşketina teknolijiyê re zarok ji wateya xwe ya zaroketiyê derketin, ku jiyan divê bi lîstina bi hevalên xwe re û derketina kolanan naskirina derdor û fêrbûna dibistanê bi rûniştandina ser telefon re hatiye guhertin, di dema niha de zarok serê xwe ji telefonê dernaxin û nabînin ka çi li derdora wan çêdibe. Bi taybet bi derketina lîstoka babcî re ku hişê tevalî mirovan bi temenê cûda biriye. Parvekirina bi xerîban re, ku pir caran dibe sedema pirsgirêkên wekî şantajkirina serhêl. Bandor li ser tenduristiya derûnî ya giştî ya zarokan dike û zirarê dide wan. Girêdayîbûna lîstikên elektronîkî, ku bandorê li ser tevgera wan ku dibe sedema pirsgirêkên civakî û psîkolojîk. Zêdebûna giraniyê û qelewbûn, ku dikare bibe sedema pirsgirêkên tenduristiyê yên cidî. Em dibînin di warê xwendinê de zarok gelek bi paşketine ji ber ku hemû dem axwe li ser înternetê derbas dikin ev jî xeteriyeke mezin ji bo nifşê pêşrojê ye.

Di dawiyê de, teknoloji bûye rastiyek ku nayê înkarkirin, lê belê dijwarîya rastî ne di hebûna wê de ye, lê di awayê bikaranîna wê de ye. Têkilîyên malbatî ne bi hejmara peyam an bangan, lê bi kûrahiya têkilîya rastîn a mirovan têne pîvandin. Di navbera cîhana dîjîtal û jiyana rastîn de, hevsengî ji bo parastina malbateke hevgirtî û civateke saxlem mifteya sereke ye, ku nirxên mirovan ji her ekranê xurttir dimînin.